kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

bîrnebûn

86
2023



Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 86/ 2023
Ansvarig utgivare: Alî Çîftçî
Edîtor: Alî Çîftçî, Hecîyê Gulê, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê
Alî Çîftçî, Sedat Turan, Seyfî Dogan, Mem Xelîkan,
Muzaffer Özgür, Hayrettin Güven, Mistoyê Heco,
Elîyê Yiwoyî Fîtê, Adem Özgür, Prof. Dr. Haci Akman
Mehtab Îdelî, Xizan Şîlan, Bilal Celepli, Ecevit Yıldırım,
Hızır Akbina, Şefîq Pêşeng, Rojvan Enes, Mistefayê Nurî

Belavkirin / Distribution:
Ewropa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Numra kontoya li Swêdê:
(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Bîrnebûn"Bankgiro-Stockholm/Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874
Çap / Baskı: Apec-Tryck AB

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 30 TL
Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Medya Kitapevi
Bekar Sokak No: 7, Giriş kat.
Beyoğlu / İstanbul / Türkiye

Adress
Navnîşana li Swêdê
Apec
Mjölnarstigen 1
SE 163 41 Spånga/Sverige
E-post: info@apectryck.se
Internet: www.birnebun.eu

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin. Ji ber stîl û devokên taybet em dest nadin hinek nivîsên nivîskarên xwe.

Waqfa Kurdên Anatolîya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

bîrnebûn 86 2023

Wêneyê berga pêşîn: ji erdheja 6ê sibatê
Îlustrasîyon û grafîk: Runak Resulpur

ISSN 1402–7488

Naverok

Ji bîrnebûnê	4	Alî Çîftçî
Erdheja 6ê sibatê	6	Bîrnebûn
Konferansa li ser Mîrasa Çanda Kurdî	10	Sedat Turan
Hesman	14	Seyfî Doğan
Bülent Pekerman wek serokê meclîsa kantona Baselê ji Partiya Lîberal a Keskan hat hilbijartin	16	Elîyê Yiwoyî Fîtê
Kilamên me, kilama Topê	22	Mem Xelîkan
Xwelî li serê we be!	24	Mehtap Îdelî
Sînopsîs	26	Mistoyê Heco
Stranbêj Ayfer Duztaş	28	Adem Özgür
Cîhanbeylî û êşa 52 rojan – 5–	34	Muzaffer Özgür
Teqe û ro -1	40	Adem Özgür
Bilûrvanê bi nav û deng, Mehmedî Mamê	42	Hızır Akbina
99 gotinên Albert Einstein	46	Wergera ji almanî: Nuh Ateş
Hişmendîya dîndar	48	Ecevit Yıldırım
Doşo	55	Şefîq Pêşeng
Çima Muze	60	Prof. Dr. Haci Akman
Axîna bajarên rengîn	70	Xizan Şîlan
Qerfo	72	Seyfî Doğan
Quto	73	Seyfî Doğan
Jin û etîmolojîya du navên qedîm: Bodê û Bostan	74	Bilal Celepli
Ezî heftê salî me	77	Seyfî Doğan
Zayenda zarokan	78	Mehtap Îdelî
Xeyala zimên	88	Rojvan Enes
Dengê gundê min– II	91	Hayrettîn Güven
Newroza 1979	93	Nureddîn Zaza
Xwediyê Edeletê	94	Mistefayê Nurî

Ji Bîrnebûnê

Di 6ê zivistana paşîn a 2023an de li welêt erdhejek mezin pêk hat û piştre bi sedan erdhejên bi pêl û pileyên nizm peyderpey pêk hatin. Di erdhejên destpêkê de bi sedhezaran kesan jiyana xwe ji dest dan û ji ber wêranbûna avahîyan û zerara madî li herêmê bandoreka pir mezin kir. Hîn jî bi milyonan kes di xetereyê de ne.

Hewldanên yekser piştî erdhejan û rojên paşerojê li ser lêgerîn û rizgarkirinê, dîtina kesên sax di nav kavilên avahiyên hilweşiyayî de bûn. Pêdiviyên din ên lezgîn peydakirina lênihêrîna bijîjkî ji kesên birînên laşî, xwarin, ava vexwarinê û stargeh ji bo hemî kesên ku malên xwe winda kirine. Li ser erdhejê bi sernivîsa *Erdheja 6ê sibatê* gotara kovarê hatîye nivisîn.

Roja Zimanê Dê di sala 1999an de ji bo ku mafê axaftin û nivîsandina bi azadî bi zimanê xwe yê dayîkê bîne bîra herkesî hat damezrandin. Ev roj li seranserê cîhanê bi çalakîyên curbecur ên wekî konferans, konser û semîneran hat pîrozkirin.

Hişmendiyek zêde heye ku ziman di pêşkeftinê de, ji bo cihêrengîya çandî û diyaloga di navbera çandan de, di heman demê de ji bo xurtkirina hevkarîyê, avakirina civakên zanistî yên berfireh û di parastina mîrata çandî de rolek girîng dilîze.

Bi wesîleya 21ê Sibatê, **Roja Zimanê Dayikê** ya UNESCOyê li seranserê cîhanê çalakîyên curbecur ên li ser zimanê dê hatin lidarxistin. Mixabin, li welat û di nav însanên me de, ne ev hişyarî heye û ne jî aktîvîteyên berbiçav têne organîzekirin.

Şerê Rusya û Ukranyayê ku 24 sibata 2022an de dest pê kiribû, ev bû yek sal e, hin jî berdewam e! Ev şer bandoreka mezin li seranserê welatên Ewropayê û herwiha li hemû cîhanê dike. Bandora herî mezin li welatên paşdemayîn û xelkê xizan dike. Bi taybetî di bin sîya vî şerî de pirsgirêka kurdan ku berî wê li seranserê cîhanê pir guncav bû, niha qet nayê rojevê!

Di vê hejmarê de dîsan birêz Mem Xelîkan bi sernivîsa *Kilamên me*, kilama Topê û serpêhatîya wê nivisîye!

Di zivistana pêşîn a 2022an de konferansa li ser *Mîrasa Çanda Kurdî* ku ji alîyê Waqifa Kurdên Anatolîya Navîn-KAN, kovara Bîrnebûnê û Kitêpxaneya Kurdî ya Stockholmê ve hatibû organîzekirin, bi sernivîsa *Konferensa li ser Mîrasa Çanda Kurdî,* bi kurteşiroveyeka Sedat Turan hatiye nivisîn. Bi wê wesîlê em xêrhatina birêz Sedat Turan dikin ku dê ji vir û pê ve carna di kovarê de binivisîne.

Li kantona Basela Swîsreyê ji Partîya Lîberal a Keskan, Grünliberale Partei (GLP) **Bülent Pekerman** ji gundê Kelhesen, ji Anatolîyê wek serokê meclîsa kantonê hat hilbijartin. Kovara me bi birêz Bülent re bi sohbetekê ev serkeftina wî dide naskirin.

Hevkarê me Adem Özgür bi hevpeyvînekê bi stranbêj Ayfer Duzdaşê re li ser karê wê sohbetek kirîye. Birêza Ayfer li ser mûzîkê weng dibê; *Muzîk ji bo hemû gelan hêmaneke girîng e. Lê ji bo civaka kurdan bi bawerîya min fonksiyon û girînngîyeke wê ya gelekî mezintir*

heye. Dengbêj, jinên dilşewat, stranên ku di dawetan de tên gotin hemû vegotina jiyanê ne.

Muzaffer Özgür zîncîre nivîsa xwe ya *Bîranînên bi êş yên jineka rojavaya Tirkîyê, Cîhanbeylî û êşa 52 roj*an di vê hejmarê de bi dawî anîye!

Adem Özgür bi navê *Teqe û ro* dest bi serborîya xwe ya hepisxanê kirîye.

Hizir Akbîna li ser bilûrvanekî ji Anatolîyê, ***Mehmedî Mamê*** bi me dide naskirin.

Birêz Nuh Atêş ji *99 gotinên Albert Einstein* 23 ji wan ji zimanê almanî wergerandîye kurmancî.

Ecevit Yıldırım bi sernivîsa *Hişmendîya dîndar* li gor çavkanîyên ji încîlê hinek bûyer an çîrokên ku hene li gor xwe şirove dike û ev têgeha hişmendîya dîndar ne di maneya dîndarîya olî de bi awayê nirxandinê bi kar anîye.

Birêz Şefik Pêşeng rojnamefirojekî bi navê *Doşo* dide naskirin. Şefik bi naskirina rehmetîyê Doşo re Dîyarbekira qedîm kuçe bi kuçe şûnên bi navûdeng bi me dide naskirin.

Prof. Dr. Hacî Akman, bi sernivîsa *Çima muze* nivîseka balkêş û giring li ser rola muzexaneyan di **bîr û nasnameya civakî** de çi ye, amade kirîye. Di vê nivîsî de projeya xwe ya belgekirina *Mîrasa Kultûrî ya Kurdî ya Norwêcê* ku di 2004an de dest pê kirine jî bi çend wêneyên ji muzexaneyê cih girtîye.

Xizan Şîlan, bi helbesta *Axîna bajarên rengîn*, helbestek bi mebesta erdhejê nivisîye.

Bilal Celepli, *Jin û etîmolojîya du navên qedîm Bodê û Bostanê* kurtelêkolîneka etîmolojîk kirîye.

Mehtep Îdelî ji dema berê de ji bo ku meriv zanibin, zarokê di zikê dayika xwe de keç e yan lawik e, hinek rêbazên ku wê demê, ji dema Misira kevn de bi kar dianîn û yên li ba kurdan çawa bûye, lêkolaye. Ev lêkolîna balkêş bi sernivîsa *Zayenda zarokan* û bi sernivîsa *Xwelî li serê we be!* li ser erdhejê di vê hejmarê de nivisîye.

Birêz Mistoyê Heco, bi sernîvisa *Sînopsîs*, Seyfî Dogan bi çend helbestên xwe û Xoyretînê Mihemmedî Seîd bi sernivîsa Dengê gundê min -2 nivîsandine.

Nivîsa bi navê *Xeyala zimên* ji alîyê Rojvan Enes ve hatîye nivisîn. Birêz Rojvan li ser zimanê niviskî û yê dengkirinê disekine. Bo nimûne bi lêvkirina hinek gotinên ku li hinek deverên Kurdistanê û di nav hinek gundên kurdên Anatoliyê de wek nimûne dane.

Em hêvî dikin ev hejmara jî li gor dilî we be! Bi vê hêvîyê Newroza 2023an li me giştikan pîroz be! Mixabin di her destpêkeka biharê de xelkê me hertim tûşî tofanên mezin bûye, wek 16 adarê ku bajarê Helebçeyê bi karanîna çekên kîmyayî hemû zindîyên vî bajarî hatin kuştin. Niha jî ev erdheja giran di ser welatîyên me de weke ewrekî reş î tarî girt!

Em li vir bi taybetî êşa wan hemû kesên ku malbatên xwe di erdhejê de wenda kirine parve dikin û bila serî gelê me sax be! Me hevkar û dostekê xwe yê qedirbilind Hesmanî Şêmlî wenda kir, bila serê malbata Hesmên, hevkarên kovara Bîrnebûnê û gelê kurd sax be!

Heta hejmara bê binîmin di xêr û xwaşîyê de.

Alî Çîftçî

Erdheja 6ê sibatê

Li bajarên Hatay, Entep, Mereş, Semsur, Meletî, Xerpêt, Ruha, Amed, Efrîn û Helebê, bi qeza û gundên li derûdorê, ji ber du erdhejên bi pileyên 7.8 û 7.5 rûdan û bi sedhezaran mirî û maxdûrên erdhejê bandoreka mezin li pişt xwe hîşt!

Li ser medya civakî yek nimûne:

"Li vir kesek heye! Li vir kesek heye!"

Lê belê li derdorê kesek tune, bi tenê ronahîyeke mat û bêdengîya barîna berfê heye.

Mêrikek nêzî keçika ku laşê wê ji singê ve bi betona hilweşîyayî ve asê maye. Meriv dizane ku ew hev nas nakin.

"Tu tî yî?" dipirse.

Keçik bersivê dide *„Ez diqerisim". "Birayê min jî li vir e."*

"Tu dikarî bilivî?"

"Na", keçik bi dengekî zaîf bersivê dide. Tevî dengê xwe yê nizm jî, dawîya dawî dikarî xwe bide bihîstin. Lê di çavên wê de hêvî tuneye. Ev nîv roj e ku erdheja yekem serê sibehê saet di

çaran de çêbûye. Di demeke nêz de dê dîsa bibe êvar.

”Tu dikarî lingên xwe bilivînî?”

Keçik bi dengekî hişyar dibêje ku têgihiştina wê zehmet e. Li ser rûyê wê gotineke nû heye, mîna ku tiştekî vedişêre, an jî mîna ku ji têkçûneke şexsî şerm dike.

”Tu li vir bimînî. Ez ê herim ji bo te alîkarîyê peyda bikim û em ê te ji wir derxin.

Lê mêrik bi bawerî xuya nake. Ev taxa ku ji ber erdhejê bi erdê ve bûye yek, dibe ku dûrî navenda bajêr be. Ji ber ku hemû kolan pir xera bûne, wê alîkarî dereng bimîne. Ne mimkun e ku di demeka nêz da were.

Hin ji wan kesên li vir dijîn, dibe ku bi saxî ji malên xwe yên hilweşiyayî, di nava şeva berfa tarî de rêya xwe peyda kirine, ji bo xwe ji sermayê biparêzin çûne cîyekî din. Ji bilî keçikê û birayê wê, mimkun e ku di malbata wê de tu kes sax nemaye û ji ber vê yekê kes li wê nagere!

Cara dawî dîsan ev keçika asê mabû dibê; ”*Neçe!*”

Mêrik dibêje, „*Divê ez biçim, lê ez ê vegerim .*“ “*Ez ê te ji bîr nekim. Ez ê alîkarîyê peyda bikim.*“

Em dibînin ku keça ku tevahîya rojê li vir bi tena serê xwe asê maye, ji niha ve dest bi amadekarîya mirinîyê kiriye û hêza wê ya îtirazê nemaye.

Lê dîsan jî careke din dibêje „*Neçe!*“ bi dengekî pir qels.

Mêrik dîsan dibêje, „*Ez ê herim ji te re alîkarîyê bînim* „ û her çend dengê wî niha bilind dibe jî em bi rastî jê bawer nakin.

Ev der cîyê ku qeyda wî ya bi telefonê bi dawî dibe. Em nizanin bê ka wî alîkarî peyda kir an na. Qeyda wî yek ji hezaran bêhêvî û nîşaneyên di cih de bû ku me di wê roja ewil da temaşe kir. Wekî gelek kesên din, zilamê ku keçika biçûk a ku kişandiye vîdeoyê li ser medya civakî rasterast û bêşîrove, weşandibû.

Em li benda vîdeoyeka nû ne ku nîşan bide bê ka keçika asê mabû rizgar bûye an na!

Dîtina alîkarîyê, bi qasî ku xwedîyê kameraya mobîlê difikirî ne hêsan bû. Li gorî hejmarên fermî yên dewletê, bi qasî heft hezar avahîyên li herêmê zerar dîtine yan jî xera bûne. Hejmara qurbanan heta niha yên ku ji raporên fermî (resmî) ku dibêjin herî dawî yên

mirine zêdeyî 50,000 ne. Lê hejmara rast dibe ku pir pir zêdetir e.

Dema ku rê girtî bin û telefonên mobîl ji ber qutbûna elektîrîkê bi rêk û pêk nexebitin, agahîyên di derheqê erhêja li bajarên biçûk û gundan de pir tunene. Li ser twîtterê û di medyaya civakî de em agahdarîyên ku nîşan didin dibînin ku hin gund bi temamî hatine hilweşandin!

Ev erdheja herî mezin e ku di nava van 80 salên dawî de li welêt rû daye.

Medya ya dewletê û yên navnetewî piştî nîv rojê çûn bajarên mezin ku erdhejê ev bajarana veguherandibûn erdnîgarîyên cehenemî. Piştî erdhejê bi nîv rojê hatin wan cadeyên bi berf, baran û bayê ku bi milyonan mirovên hêrsbûyî li benda alîkarîyê bûn nîşan dan.

Xelkê bi hêvîya ku dê însanan di bin avahîyên hilweşîyayî de xilas bikin bi destên xwe yên tazî, bi saetan, bi rojan, xebîtin ku bikaribin însanan ji bin xanîyên 10-15qatî û xirabûyî xilas bikin.

Bi mobîlên xwe yên desta bi kişandina karesetê dikirin, dema avahîyên bilind hildiweşîyan û tenê çiyayên tozê li pey xwe dihiştin, xelk digirîyan û digotin,“*Ya rehma Xwedêyo*“

Pir kesan ev wêneyên bi xof ên di medya civakî de, bêyî ku şiroveyek an jî çend gotinan ji wêneyan re binivîsînin, bêyî ku ewqas şîrove bikin, belav kirine. Bi vî rengî du peyaman didin. Ya yekemîn şoka wan e: pîvana şaşbûna afatê. Ya duyemîn jî hesta bêhêvîtî û bêhêvîtîya ji alîyê tevahîya welêt ve hatiye parvekirin û bi qasî erdhejê ew bi xwe jî matmayî mane.

Dîmenên apokalîptîk (qîyametê) di cîh de ruhekî xurt yê hevgirtin û arîkarîyê di nav însanan de peyda kir, ruhekî însiyatêfa parvekirinê di mirovan de şiyar kir. Di nav pileyên xirabeyan de ku niha navendên bajarên mezin in, herkes di ber mîkrofona rojnamevanekî de xuya dikir û diqîrîya: *„Li vir fîlimê bikin, li vir fîlim bikşînin, ji me re alîkarî lazim e, em hewceyê xwarinê ne, hukûmet li ku ye, li ku ne tîmên rizgarkirinê?“*

Alîkarî ji alîyê xêrxwazan ve hat şandin, lê qemyonên ku erzaq dibirin bi saetan li rêyan hatin girtin, bi kîlometreyan dûrî cîyên bandor lê bûne asê man.

Di roja duwem de her ku diçû dengên ku ji pelên xirbe û betonê dihatin qels dibûn û gel li kolanan her ku diçû ji tirsê re rû bi rû dibû. Xelkê li ber erebeyan dest bi komkirina nan û xwarinê dikirin. Lê belê hêrs, talûke, hîsên bêhêvîyê, bêsînor bû.

Piştî du rojan hinek alîkarî gihiştin navendên bajarên mezin. Lê ji bo gelek mirovan pir hindik û pir dereng bû!

Li gorî hejmarên rayedarên tirk bandora erdhejê li 13,5 mîlyon kesan bûye. Li gorî *Rêxistina Tenduristîyê ya Cîhanê* WHOyê dibe ku li Tirkiye û Sûriyeyê heta 23 milyon kesî bandor kiribe.

Bîrnebûn

Konferansa li ser Mîrasa Çanda Kurdî

Sedat Turan

”Ez kî me, ez niha diçim kuderê?” Bi salan, bersiva pirsa ”Ez kî me” hatiye veşartin. Bersiva ”Ez kuda terim” jî îroj ne hêsan e. Gelo em dikarin pêşîya xwe vedin û bibînin ka em kuda terin?

Em rojeka zivistanê bûn nîvanê Waqifa Kurdên Anatolîya Navîn-KAN li Stockholmê, li mekteba şemîyê. Mamoste Hacî Akman seminerek li ser Mîrasa Çanda Kurdî da. Li dû gotina mamoste me fehm kir ku em gih jî malxewên in, ne nîvan!

Destdirêjî li mîrasa çanda kurdî hatiye kirin!

”Bi her awayî destdirêjî li mîrasa çanda kurdî hatiye kirin.” Û ew destdirêjî bi destî dewletan wek stratejîk, institusyonal tê kirin. Sala 1979, nivîskar Memed Êmîn Bozarslan, alfabeya kurdî çap kir. Ji bo wê, 60 sal ceza xwar. Ew jî yek wan tiştên ku li ser mamoste Hacî bandor çêkirîye. Birêz Hacî çeprastîyên wî di muzeye Brîtanya (mamoste 4 meha li muze kar kir) dîtiye jî me ra qal dike.

”Berî muzexane tiştekî derxe holê, nivîsek qurt dinivisin. Ew nivîsa bixwe hikm e û mejîyê te da şin dike. Çendek tiştên kurdan jî wir tê pêşkêş kirin; xalî, kinc, pere (ji merwanîyan), û tiştên destî. Mixabin, tekst kurt û bê înformasyon in. Zêdetir tiştên kurdan jî nê qebul kirin. Ew bi navê ereb, tirk û farisan tênê nîşandin. Qet kesî nebînin, dibêjin ew a koçera ser çîyayê ne! Yek jî wan tiştan, fîgûra **Tawûsê Melek** e. Muze wê wek îslamî pêşkêş dike, lê yê rastî ew îslamîyetê da qedexe ye!

Tawûsê Melek, British museum, London

Min rojekê dît ku *Şerefname* ya Şerefxan Bedlîsî, ku di 1597an de li ser dîroka kurdan nivisîye, wek berhemeka erebî nav kirine. Berpirsiyarê beşê Rojhilata Navin yekî ereb bû, û got ew ereban ra girêdayî ye. Ez bi berpirsîyarê muze re ketim têkîlî û min ew rexne kir.” Xêrnexwazî her alîyê heye. Şerm e ku

- UNICEF hişt kû **Hesenkeyf** – dîroka me bin avê keve
- FN (Yekitîya Mîletan) gelê me, kurdan ên 50 milyon kes, nas nake



Haci Akman ji kurdên Anatoliyê, gundê Burunagil a Konyayê ye. Profesor e li universîteya Bergenê, beşa etnolojîyê, 33 sal in li wir kar dike.

"Çand û dîroka kurdî nerast va girêdayî ye, divê yê rast were pênase kirin"

Emila Durkheim (fîlozofê almanî) di pirtûka *Xwe Kuştin* da dibêje "Ez û xwû dij hev bim, ew kuştin e."

Çawa rastîyê pênase bikin?

Çawa civak bi bîrbîne?

Li gor mamoste:

<u>Gerek em kolêktîfîtîyê kar bînin</u>

- Têkîlî bi rewşenbîrên me ra çê bikin.
- Bi hev ra kar bikin
- Xwedî xwe û tiştên xwe derkevin

<u>Gerek stratejîya me hebe</u>

- Em pîrozwahî çê bikin
- Ew pîroz be kes nikara destên xwe bavêje.
- Komkujîya Halabja, dîrok, dengbêjî, ziman pîrozwahîyên me ne
- Em muze/arşîv ava bikin

"Ez kî me, ez niha diçim ku derê?"

Her gundên Norveçê çûk-mezin mûzexane hene. Ew bala mamoste kişandîye û rojekê ji gundîyekî pirs dike ku ew ji bo çi ne. Gundî bersiv da; "Sibê, ez ê bimirim, zarokê min bixwaze tişt werin bîra wan ka em çawa dijîn."

Muze mîna arşîvekê kar tê. Ew dibe referans, cîyekî ku tu here bibînî û hîn bibî.

Wek Cegerxwîn gotîye: "*Eger hûn nebin yek, hûn ê herin yek bi yek*"

Mamoste Haci Akman Konferansa Mirasa Kurdî da. Pir kes hatibûn konferansê û tu kes dijî wê derneket. Wek xûya kir ku em - kurd ne dijî hev in.

Konferans di 3ê zivistana pêşin 2022, li Stockholmê ji alîyê ***Stiftelsen-KAN*** (Waqifa Kurdên Anatolîya Navîn-KAN), kovara Bîrnebûnê û Kitêpxaneya Kurdî ya Stockholmê ve hatibû organîzekirin.

Roja Evîndara ya Kurdî li mekteba şemîyê di 18ê zivistana paşîn de bi bejdarêya zarokên mektebê û dê û bavên zarokan ve hat pîroz kirin.

Sêva mêxekrêj, sembola evîn û aştiyê ye.

Sêva mêxekrêj heman sêva xwezayî ye ku piştî mêxekrêjkirnê bi kêmî sed sal dimîne û bêhna wê jî hertim heye.

Ev sêv kevneşopiyeke kurdî ya resen e û sembola aştî û evînê ye. Piranî ji bo du armancan hatiye bikar anîn:

A yekemîn, gava mirov evîndar dibû û nedikarî evîna xwe bi gotinan bêje, sêveka mêxekrêj (qernefîl) dikir û ji evîndarê/a xwe re wek nîşana evînê dişand.

Ya duduyan, dema ku du evîndar an du mirovên nêzîkî hev ji hevdu dixeydîn, wan sêvê ji bo lihevhatinê bikar dianîn.

Hunermendê kurd Sêywan Saedian ji sala 2004an ve di çarçoveya çend projeyên hunerî yên li ser asta neteweyî û navneteweyî de hewl dide vê kevneşopiya kurdî ji nû de vejîne û cîhanî bike.

Heya niha li gelek welatan projeyên Sêva Mêxekrêj hatine lidarxistin û îsal (2023) li Swêd, Norwêj, Swîsre, Almanya, Amerîka, Kanada, Fransa, Tirkiye û Kurdistanê pêk hat.



Hesmanî Şêmli

hevkarê kovarê li bajarê Berlînê çû ser dilovanîya xwe! Li vir hat veşartin. Hesman di sala 1955an de li gundê Xelikê Jor hate dunê. Di sala 1970î de barkir Almanyaya rojava û heta roja çûyî ser dilovanîya xwe li wir jîya. Em li êşa malbata wî parva dikin!

Redaksîyona kovarê

TRAUERFEIER
21. Februar 2023

Weltliche Zeremonie in der Kapelle
Trauerrede von Herrn Laaser
Songs von Yanni und Bill Withers
anschl.
Muslimische Zeremonie auf dem Friedhof

Tot ist überhaupt nichts:
Ich glitt lediglich über in den nächsten Raum.
Ich bin ich, und ihr seid ihr.
Warum sollte ich aus dem Sinn sein,
nur weil ich aus dem Blick bin?
Was auch immer wir füreinander waren,
sind wir auch jetzt noch.
Spielt, lächelt denkt an mich.
Leben bedeutet auch jetzt all das,
was es auch sonst bedeutet hat.
Es hat sich nichts verändert,
ich warte auf euch, irgendwo sehr nah bei euch.
Alles ist gut.

Henry Scott Holland (1847-1918)

Hesman

Tu bara wenge giran
Mina xemgînîyê ku
Em nuha hîs dikin tunen
Di tarî û giranîyê xemgînîyê de
Derek em li ber xwe bidin
Heya ku roj vedigere

Hesman!
Bîranînên te mina gulên xweşik in
Germîya te pêl bi pêl belav dibû û can û ruhê me germ dikir
Tu yî bi cesaret bûyî
Tu wek te raman dikir jîyayî
Azad serbest û bi serî xwe
Tu ji bawerîyê xwe re sadiq
Te fikirên xwe vekirî digotin
Û hertişt ji dil da dikir
Bi jîrî, jêhatî û bipêkhatîya xwe
Bûyî karsazekî serfiraz
Li ba û bahozan
Tu ji kaptenên xeşim re buyî lîman och rêber
tu yî sergowend buyî

Ji civîna hevkarên kovarê li bajarê Frankfurtê, Almanya 2017

Hesman! tu, insanekî welatperwer û dilsoz bûyî
Te madî û manêvî piştgirtîya kovara Bîrnebûnê dikir
Te li xelika baxçek bi hevês ava kir
Baxçe; dera jîyanê, dergeha mêwanên te
rojê bûk siwar kirinê stûdîya bûk û zava yên gund
Û mala flora û fauna bû hîn jî wang e
Li wî baxçî te mîrasên kûltûra me
ji bo deme nu û ji deme pêşeroj re kom dikir
dixwast ji neslê pêşeroj re wek mîrasê netewî cîhbilî.
Hesman, em ji hev re ci bûn
Em hîn jî wengi nî
Demên jîyanên ku bi hev ra hatibûn xemilandî
Bîranînên bêdawî ne.

Seyfî Doğan

Li kantona Basela Swîsreyê ji Partîya Lîberal a Keskan, *Grünliberale Partei* (GLP) Bülent Pekerman kurdekî ji Anatolîyê wek serokê meclîsa kantonê hat hilbijartin.

Elîyê Yiwoyî Fîtê

Di dîroka Baselê de cara yekê ye ku xerîbekî ne li Swîsreyê hatîye dunyayê, dibe serokê meclîsê. Pekerman ji 99 parlementeran dengên 87an wergirtîye. Ji sala 2021ê ve di Encumena Mezin a Kantona Baselê de ye. Ew ê ji meha sibatê pê ve ji bo salekê serokatîyê bike.

Bülent di sala 1977an de li Anatolîya Navîn, li gundê Kelhasan ku girêdayî Cihanbeyli, Konyayê ye, hatiye dunyayê, 45 salî ye û mamosteyê ajotina erebeyan e. Xwedîyê dibistana ehlîyetê ya ***Fahrschule BuLi***yê ye û bi saya tercubeya wî ya karsazîyê di karê xwe yê sîyasî de jî yekî jîr e!..

Ew nimûneyekî bêkêmasî yê kantona Baselê ye.

Me wek kovara Bîrnebûnê xwest em Bülent Pekerman ji bo xwendevanên kovarê bidin nasîn. Me pê ra sohbetek kir ka ew kengê hatîye Swîsreyê û bîngeha serkeftina wî ya xwendinê, kar û sîyasetê çing bûye?

– Ez berî ku bêm Swîsreyê min mekteba destpêkê li gund û ya ortaokulê jî li Konyayê xwend. Min di 15 salîya xwe de, di1992an de koçî Swîsreyê kir. Bavê min di sala 1984an de hatibû li Swîsreyê bûbû îşçî. Wexta ez hatim, di salê min de pir heval an nasên min tunebûn. Ji ber ku min ziman

Bülent bi dê, xwîşk û birayê xwe ve cara siftê tênê Sîsreyê, dema ji balafirgehê derdikevin

nedizanî hevalên min ên swîsreyî jî tunebûn. Min salekê tenê dersa ziman, fêrbûna almanî û fransî xwend. Mamosteya min însaneka pir baş bû, wê didît ku ez zû ziman fêr dibim, alîkarîya min dikir. Ez bi almanî re diviyabû fêrî fransî jî bibûma. Zimanê min î dê, kurmancî jî min rind dizanî. Wê ez fêr kirim ku ez ferhenga xwe bi xwe çêbikim, bi kurdî-almanî. Ji bo ku ez bikaribim gymnasîyumê (lîsê) bixwînin lazim bû ez van herdu zimanan rind bizanibim.

Xwendin û nivîsandina min a kurdî, ez hîn li welêt bûm bi rêya Azadîya Welat fêr bûbûm. Wexta em diçûn me rojnamên bi zimanê tirkî distandin me Azadîya Welat jî distan û dikir nav rojnamên tirkî ku ti kes wê nebîne û me dîna mal, li mal me dixwend.

– Min piştî salekê dest bi gymnasîyumê kir, çar sal xwend, lê sinifa dawîn min nikarîbû xilas bikim, bi min giran dihat. Piştî wê min dest bi dibistana meslekî kir û piştî ku min ew xilas kir, min dixwest ez bibim mamosteyê mekteba destpêkê. Ji bona amadekarîyên îmtihanê min saleke vala (boş) da ber xwe. Di vê navberê de bavê min got: va ye ez taksîyê dajom were tu jî hetanî

Bülent aliyê hevalbendên xwe yên ji Partîya Lîberal a Keskan, (GLP) ve bi plakata; *Bülent Pekerman pîroz be, serokê yekem ê GLP BS* tê pîrozkirin.

ku wexta te jî heye di dawîya heftê de carna kar bike, hinekî pere jî qezenc bike, min ehlîyeta taksîyê wergirt. Dûre ez çûm mekteba mamostetîya fêrkirina erebeajotinê. Li wir min pedegojî jî xwend. Piştî min dîploma xwe wergirt min dibistana fêrkirina ajotina erebê (Fahrschule BuLi) vekir û hîn jî wî karî xwe berdewam dikim. Lê min ti caran ji bîra xwe nebir ku diviyabû ez gymnasîyûmê xilas bikim. Di rû karê xwe de min her xwendina xwe jî berdewam kir. Min dûre gymnasîyumê xilas kir û niha beşa hiqûqê dixwînim. Zewicîme, keç (Lorîn) û kurek (Ronî), du zarokên min hene.

Te li Baselê wextekê radyoyeka bi zimanî kurdî vekiribû?

– Di salên 2000an de, min di ciwantîya xwe de gelek xebat ji bo zimanê xwe yê zikmakî jî kirin. Weke çend mînak: min gelek

salan perwerdeya zimanê kurdî bi zarokên kurd ve di dibistanên swîsrî de kir. Dîsa di salên 2000an de herwiha min radyoya kurdî ya yekemîn li ser înternetê jî ava kir û weşan kir. Navê radyoya min ”Radio Azadî” bû. Ev tenê li ser înternetê dihat guhdarîkirin. Li Baselê radyoyek lokal bi navê Radio X hebû û li wir jî min her hefte saetekê bi kurdî weşan dikir. Her wiha rûpela înternetê (website) bi navê Bulican.com jî min çêkirîbû û ev ji alîyê gelek kesen ve dihat zîyaret kirin.

– Hertim ku sal derbas dibûn min êdî biryara xwe dabû ku ez ê li wî welatî bimêm û min dixwest di civata Baselê de tev karî sîyasî jî bibim. Di nav partîyên mezin de sîyasetkirin ji bo min zor bû ji ber divê meriv dîrok û paşeroja wan partîyana rind bizanîba û xwedî tercûbeyeka salane bûya. Ya din jî partîyên ku hebûn, çi yên çep û çi jî yên rast, ne gor dîtina min bûn. Sala 2007an partîyeka nû ya lîberal bi navê Partîya Lîberal a Keskan (GLP) hatîbû avakirin. Di partîyeka weng de karkirin hem ji alîyê bernama wan a xwezayî û civakî û hem jî ji ber nûbûna wê pir nêzî dîtinên min bû. Ez bûm endamê vê partîyê û min aktîv kar kir. Di sala 2008an de li Baselê jî hatibû avakirin. Di eynê salê de di hundurê heft mehan de hilbijartina kantona Baselê hebû. Partîya me bi pênc parlementeran ket meclîsa Kantona Baselê, ez jî yek ji wan bûm, ji 2009an heta 2013an endamê meclîsê bûm.

Ez dibînim ku ji 1992an ve ku tu hatîye Swîsreyî, te ti wexta xwe vala derbas nekirîye. Ev tiştê ku hewqas enerjî dida te çi bû û tu vê serkeftina xwe bi çi ve girêdidî?

– Dê û bavê min hertim digotin: me nexwend, hûn bixwînin!.. Dawxaz û hêvîya wan ev bû. Kalê min digot: ”Bülent ku tu nexwînî, tu nikarî çalekî fênî jî ji erdê hilde û bidî ser milê xwe”. Gotina wî hîn jî di guhê min de ye. Min jî ji xwe re kiribû visîyon û xeyal ku divê ez vê xwendina xwe berdewam bikim. Min ti carî ji van hedefên xwe paşda gav navêt. Îmkanên ku hebûn, qasî ji min hat, min bi kar anîn. Min ti carî wexta xwe vala derbas nekir. Divê meriv xwadî vîsîyon be.

Tu niha wek kesekî xwedî tercube, çi pêşnîyarên te ji bo dê û bavên kurdên me hene, yên derveyî welêt ku li welatên Ewropayê dimînin? Divê dê û bav çi bikin ji bo zarokên wan bikaribin di civata vir de serkeftî bin?

– Bi ya min, divê dê û bav berî hertiştî wextê xwe bidin zarokên xwe, bi wan re di nav aktîvîteyên zarokan ên di civata vira de cîh bigrên û xwe ji civata vir dûr nexin. Zarokên xwe ti carî zor nekin ku ew ê çi bixwînin. Ya muhîm (girîng) ev e ku bibin xwedî meslekekî ku zarok jê hez bikin.

Ne lazim e herkes bibe doktor, muhendîs an sîyasetmedar. Ya girîng ev e ku di meslega xwe de zana bin û bibin xwedî dîplome. Eger bixwaze bibe boyaxcî an qunderecî, yanê çi mesleg be bila bibe, ba zarok bi xwe hilbijêrin. Ku kesek ji karê xwe hez bike, yê herdem pêş keve.

Mala te ava, ji bo te ev wexta xwe da me! Gotinek an mesajeka te ji bo kovara Bîrnebûnê hebe, fermo!

– Kovara Bîrnebûnê, xebateka pir bi qîmet kirîye heta niha. Divê berdewam be. Ez kovarê dişopînim û dixwînim. Ji bo me ev kovar dibe arşîvek. Divê her însanê me xwedî li kovarê derkeve. Bo me muhîm e berdewamîya wê. Bo nimûne niha ev sohbeta me kirî û karê me tê arşîvkirin. Ev karekî bi rûmet e. Ez jî sipasîya we dikim ji bo vê sohbetê!

Her serkeftî be!

Bülent di xortanîya xwe de

KILAMÊN ME (XI)

Mem Xelîkan

Kilama Topê

Nûr, ji gundê Hecomera ye. Hecomera gundekî girêdayî, Yunaka Konyayê ye. Jineke bî ye. Ji zewaca wê ya yekemîn, du keçên wê yên salbiçûk hene. Top û Men. Qedera wê ji hev dibe, dibe bûk dihere gundekî Cîhanbeylîyê, Kûtiga zewaca xwe ya dudîya dike. Herdu keçên xwe jî bi xwe ra dibe Kûtiga. Li mala mêrê xwe, li cem xwe mezin dike.

Nûr û keçên wê, li wî gundî jiyanek baş dijîn. Top û Men, mezin dibin. Dibin keçen bedew û çeleng. Dibên ”çavên evînê yê kor in”. Ji Kûtiga, Mehmikê Xêtib dilê xwe dikeve Topê. Bi ser wê va, Top jî dûre dûr va wî hez dike. Evîneke mezin dijîn. Lê astengîyek mezin heye. Mehmikê Xêtip, zewicî ye bi jin e, zarokên wî hene. Dixwaze Top, here ser hewîyê. Herdu evîndar, bi dilê xwe nikanin. Mehmik, Topê direvîne. (sal 1965). Top dihere ser hewîyê. Herdu dildar digêhêjin ber miradê xwe.

Rojên li cem hewîyê, pir baş derbas nabin. Ji dest hewîyê Top, zor û zordestîyê dibîne. Jiyana Topê, wek berê pir baş nameşe. Bi ser wê da jî, sala 1972an Mehmikê Xêtib bi qezake trâfîkê ya mezin wenda dike. Li rêya Ereglîya Konyayê, bi qamyona xwe ya ku barê wê xwê ye ji para li qamyonekê dixe. Qamyona Mehmikê, ar pê dikeve û dişewite. Mehmik jî di hundir da.
DemaTop wê xebera reş digire, şewata dilê xwe û hestên xwe bi kilama li jêr tîne ziman.

Kuda kuda sîyaro, dîno kuda
Perçema reş di henîya gewr da xuda
Mirîyê xelkê mirin di malê xwe da
Mirîyê min î şewitîye di wesaîta xwe da

Wax li minê, li min nemayê
Eza seri xelîya ye guli verşîyaye
Eza şev nîvê şevê otel bi otel gerîyaye
Çima kesî suala bavê Doxanî min nedaye
(Dubare)

Xwedanî xanê xwedanî xanê
Şêxê û Begêra xanî çêkirine mîna camekanê
Diwê ma kes xwe qe nepesine
Kes mîna wî çepreşî nîne meydanê

Ez ê dînim ez ê dînim
Herim li Încova şewitî li têl xînim
Bêm Resûl Kalo paseporte xwe bişewitînin
Bavê Doxên li rêya Ereglî şewitî ye Herin bînin

Mala Şêxê derî li benê
Heri risandin dane denê
Min bane Şêxê û Begê kir em herin hennê
Xwedîye malê min gêrbûye hay ji xwe nê

Ji wê onê hetanî wê onê
Qirikê digerê li warî xwînê
Mehmikê Xêtib li xwang û bra qar kirîye
Çûyê heta îd û erefa li van derana nayê dînê

Ro ji bana narin bana
Kerî neman daketin dana
Eza Fatê bi Edûlê va bi qurbane bavê Doxan kim
Sala îsal kete nav herdê Kûtiga belav kir mîna qomîsyonê

Çavkanî: Serbilind Kanat

Xwelî li serê we be!

Mehtab Îdelî

Mixabin erdheja li Kurdistanê ji me hemûyan ra bû sedema birîn û êşên kûr. Bextreşke veng qe neqewimî bû; hişê me ji serê me çû, şevên me bûne roj, rojên me bûne şev. Hêstirkên me jixweberê li her derê dibarîn. Êş, qirrîn, bêhêvîtî, îsyan tevlihev bûn. Tiştekî eceb bû. Ew çibû? Çi hatibû serê me? Heya ku me li ser medyaya civakî dîmenên wî kesî dît, kesî ji me nikarîbû navê tiştê ku hat serê me bi nav bikira. Qala ew kesê ku xwelî li serê xwe dikir, dikim. Dibe ku we jî ew dîtîbe. Mêrekî emrmezin xwelî hildigirt û bi serê xwe dikir. Rast bû, rewşa kurdan ev bû. Xwelî bi serê kurdan bûbû.

Li ba kurdan xwelî bi ser serê xwe de kirin, tê wateya; gava mirov mal û hal, malbat, zar û zêç, û her tiştê xwe wenda kir, bêçare, bêhêvî ma, ango gava şîna xwe bigire an jî mirin û wêranî ji ber bêhêzî û xemsarîya yekî çêbûbe, digotin, "Xwelî bi serê min be!" û ev yek dihat kirin. Kurd bêçare û bêhêvî mabûn. Te digot lanet li coxrafyayê jî, li qedera kurdan jî… Kurd biçin ku li vir bextreş in. Alîyekî wan her tim eş û derd, alîyê din jî xirabe û wêranî ye. Ne Xwedê ne jî kesekî din dengê wan dibîhîze. Ev wêranbûn ne tenê karesateke xwezayî bû, herweha wêraniyeke jeopolîtîk bû jî. Dijmin bi tiştê ku hat serê wan şa bûbû û ew bêçare û bêalîkarî hiştibûn, ku ma bimirin. "Xwelî li serê we be!" "Xwelî li serê wî neyarî be!"

Bêdewletbûn zehmet bû. Mezinan digot, "Devî zû dibin dar, xwelî li kesê bêwar."

Lê, di nava vê zilmê de, yekîtî û hevgirtina kurdan hêvîyek dabû

me. Ambulansên Kurdistanê bi çirayên kesk û sor, zer û gewr sînor rakirin. Amed dîsa bûbû paytext. Apê şîna xwe ji dijmin veşartibû û xwelîya xwe bi dizî, bi serê xwe dikir. Jinan kilamên şînê bi kurdî dilorandin. Ciwanên kurd bi neynûkên xwe kavil dikolandin. Keça ku ji bin xirbeyan hat derxistin, bi rojan li benda xelaskerên xwe mabû. Dergûş hefteyekê negirîyan. Zarokên şeş salî soz dabûn bavên xwe yên di bin kavilan de mayî, ku debara malê bikin. Girtiyan di girtîgehan de, malbata xwe yên mirî di dilê xwe de veşartin. Ji wêranîya Semsûra ku me jê ra digot, wenda ye, pirtûkên kurdî derdiketin. Lîstikvanên şanoyê her yek bûbûn melekên alîkarîyê û dîsa derketibûn turneya xwe. Îcar navê lîstika wan “Xerakina dekûdolabên dewleta Tirkan” bû.

Dengê Ebdulla Peşêw ji başûr dihat û digot:

Ta ku çiraya me geş nebe,
Hûn ê tu carî ronahiyê
Bi çavên xwe nebînin
Ta ku em dil û kole bin,
Em ê her mirkût û nîran,
Toq û zincîran li we kin!
Hûn ê me qir bikin?
Xwelî li serê we be!
Ger em bimirin jî,
Em ê tenê dîlîtiya xwe
Ji dest bidin, wenda bikin.
Ma çi dîlîtiyê taltir e?
Ger em bên kuştin jî,
Ma kî ji koleyê şehîd Zaltir e?
Hûn ê me qir bikin?
Xwelî li serê we be!
Piştî mirinê jî
Em nahêlîn hûn welatê me
Ji xwe re bikin mal,
Em rê nadin
Hûn goştê me bixwin
Weke qirereşk û qertalan!

“Xweliser ‘’
“Xwelî bi serî wer bû”
“Xwelî li serê min be!”
“Xwelî li serê te be!”
“Xwelî bi serî bûya/ê!”
“Xwelî li serê we be!”
“Xwelî li serê wan be!”
‘Xwelî li serê wî neyarî be!”
“Xwelîya vê dinyayê li serê te be!”
“Ez niha çi xwelî li serê xwe kim!”
“Bi destê xwe, xwelî bi serê xwe kir”

SÎNOPSÎS

Mistoyê HECO

Zilamekî biçûk bi xemgînî ji pencereya tramvayê, li fotografxaneya mirovên bextewar dinêrî. Li derve dîmen, sûret, deng tim diguherîn, lê bextewarîya mirovan wek xwe dima.

Diheyirî zilamê biçûk!

Diheyirî!

Kesî ji wî fêm nedikir, ne di xema kesî de bû, bi tena serê xwe, sik û sêwî mabû. Dilê wî pir diêşîya. Her tiştê wî ji dest çûbû. Herda ku li welêt hejî, di dilê wî de jî dihejîya, dilkavilî bûbû.

Dizanî!

Êş ne kêm bû ne jî mîna hev bû. Bêhempa û yekta bû.

Di wê kêliyê de dixwest bi tenê ji mirinê tiştinan bidize, zilamê biçûk.

Dizanî wê çi bike.

Berîya çendekî ew ji bihuşta bêjeyan hatibû qewitandin. Ji xalîbûneke bi qasî milyon sal mişt filitîbû û car din hatibû dinyayê. Ji feleqeya kalên miskin re derbas bûbû, di destperka cahilan de bûbû tûk û daweşîbû qulên tiwaletan.

Carekê jî bi tayê ketibû, lê dîsa jî hatibû ser hemdê xwe, pak bûbû.

Wî pir êş kişandin. Pir, pir, pir, pir… lê hê jî dixwast wan êşan bikşîne. Dinya hemû bûbû yek û bi ser wî de dihat. Nedikeserî, dikenî. Ji bihuşta bêjeyan hatibû qewitandin, lê hê jî dikenî. Di wê bihuştê de bi qasî destên celadekî pak bû. Bi qasî destên wî yên bi xwînê hatibûn şuştin…

Dikenî!

Ew bi kufrê, bi sergêjiyê hatibû tackirin.

Dikenî!

Digot, ez ê binivîsim. Peyv qalikên birînên min jê rakin jî peyvên min in, ez ê binivîsim.

Ji mirinê neditirsî. Digot, nivîs ji mirinê dizîn e. Ez ê ji mirinê bidizim.

Difikirî zilamê biçûk, şev û roj difikirî, xwe ji herkesî dizîbû û ketibû qurçikê xwe û bi peyvên xwe şa dibû.

Dizanî!

Dikarî di wê kêliyê de giyanê xwe bêdeng bike. Mirin beriya wê jî careke hatibû ber deriyê wî. Jê neditirsî. Lê, nedixwast xwe bêdeng bike. Dixwest binivîse.

Destê xwe diavêt nav porê xwe yê dirêj û ew ta bi ta badikir, zilamê biçûk.

Nivîsîn ji mirinê dizîn e û wî dixwest ji mirinê tiştinan bidize. Bi tenê dixwest ji mirinê tiştinan bidize. Çimkî her tişt belesebeb ew qas dimirîya ku wî digot, mirin ji me deyndar e. Piranîya jîyana wî li ser vê yekê terxan bûbû. Di bihuşta bêjeyan de jî, aniha jî…

Zilamekî biçûk bi xemgînî ji pencereya tramvayê, li fotografxaneya mirovên bextewar dinêrî.

Li welatê wî çem hemû ber bi jêr diherikîn, lê li vir hemû çem ber bi jor diherikin. Û got, rojekê ez ê xwe bidim aliyê herî jor ê vî welatî û xwe bi qerîna xwe têxim nava wê fotografê.

Ez ê xwe ji porê xwe daliqînim ber deriyê kenê wan mirovên bextewar…

Dizanî,

Ê belesebeb bibînin mirina wî.

Ê nizanin ku wî ji mirinê têra dinyayekê dizîye.

Bila be…

Stranbêj Ayfer Duzdaş:

MUZÎK JI BO HEMÛ GELAN HÊMANEKE GIRÎNG E

Adem Özgür

Ayfer Duzdaş, ku bi piranî stranên gelêrî yên Meletiyê yên kurmancî berhev kirîye û ew di nav gel de wek "Kilomên Arxawûnê", "Devoka Arxawûnê" û "Qaydeyê Arxawûnê" tên zanîn, di albûma xwe ya dawî da beşek ji wan stranên berhevkirî mîna diyarîyekê pêşkêşî dîroka me ya çandî dike.

Ayfer Duzdaş, hemû berhevkarîya xwe ya ku li ser stranên kurdî di navbera salên 2021 û 2022an de li gund û bajarokên Arxawûn, Yazîxan, Kureciyan û Hekîmxana Meletiyê kirine. Li gor derfetên xwe yên heyî dixwaze wan bigihîne ber destê muzîkhezan.

Hunermend, di wexta xebatên xwe yên li ser berhevkirina van stranan, ji bilî navendên bajar û bajarokan, serî li zêdetirî 15 gundan û 18 kesên zarbêj çavkanî daye û di vê demê de jî bêhtirî 90 stranên kurmancî yên vê herêmê tomar kirine. Ev stranên berhevkirî ku bi piranî hîn zêde kes bi wan nizane û ew nirxên çandî yên ku li deverê veşarî mane, lê hînterlanda wan xwedî rehenda gerdûnî ye jî, dê bi vê yekê gelemperî bibin.

Bi vê hewla xwe Ayfer Duzdaş kilamên Arxawûnê ku dikin winda bibin, bi rêya tomarkirinê diparêze û wek nirxekî çandî bi dîroka muzîkê dide qazanckirin. Bi vî awayî ev nirxên çandî yên ku hatine tomarkirinê jî, dê di album an jî albuman de bi cih bike û wek xebata dîroka devkî jî dê veguhêze nifşên dahatûyê.

Newayên Arxawûnê bi piranî bi meqamên wekî "meqamê pîran", "huseynî", "ûşaq" û "hîcaza xerîb" tên gotin û strandin.

Kilamên ku li Meletiyê tên gotin hem wek serhewa hem jî wek qaydeyên sivik meriv rastî wan tê. Li alîyê din beyt û duwazên îmaman ku di ceman de, wexta girtina semayê de tên gotin jî, xwedî cihekî girîng in. Dîsan mirov li vê dever û êrdimê pir rastî beyt, duwaz û ne-

wayên semayê tê ku ew ji felsefeya elewîtîyê ne. Ji van hemûyan re "meqamê pîran/dedan" tê gotin. Lê belê beşeke pir zêde ya van beytan ji ber asîmilasyonê êdî wisan bûye ku ew bi tirkî tên gotin.

Li vê devera hanê, ew beytên ku wek "meqamê pîran" tên pênasekirin, bi Tembûra Pîran a sêtêlî ya dozdeh perdehî, bêyî bikaranîna pêjeneyê bi teknîka ku jê re dibêjin pençe yan jî şelpe, tê îcrakirin.

Li Meletiyê ji bilî Tembûra Pîran, amûrên muzîkê yên ku herî zêde tên bikaranîn saza doxkurt, cûre, klarnet (Erebgîr), dahol û zirne û bilûr (şivan li bilûr û pîpikê didin) in. Di dawetan de jî bi piranî dahol û zirneyê yan jî dahol û klarnet tên lêxistin.

"Mûzîk cewhera jîyanê ye"

Ayfer Duzdaş, di derbarê albûma nû û xebatên xwe de ji Bîrnebûnê re deng kir û wer got:

"Em hemû di nava çandekê de çêbûne û em di wê çarçoveyê de ava bûne. Em bi vê çandê xwe îfade dikin û bi vî rengî em wekhevî û cûdahîyên xwe diyar dikin. Ne mimkun e ku meriv muzîkê ji vê rastîyê dûr bixe. Di vê wateyê de mûzîk cewhera jiyanê ye. Muzîk ji bo hemû gelan hêmaneke girîng e. Lê ji bo civaka kurdan bi bawerîya min fonksiyon û girîngîyeke wê ya gelekî mezintir heye. Dengbêj, jinên dilşewat, stranên ku di dawetan de tên gotin hemû vegotina jiyanê ne. Li wir hûn dikarin rûnin rastîya dîrokî ya civakekê analîz bikin. Semsûr, Meletî, Mereş, Çorum, Amasya, Koçgirî, Konya, Dêrsim, Dîlok, Qers… Taybetmendîyên hevpar ên civakên li ser vê

xetê dijîn, kurdbûn û elewîbûn e. Ji ber vê yekê wekhevîyên wan ên girîng ziman e. Zaravayê kurmancî yên ku ew bi kar tînin bi cudahîyên piçûk pir dişibin hev. Ev ji bo muzîka kurdî dewlemendîyeke mezin e. Ez difikirim ku ev divê were eşkerekirin, parastin û ji bo girseyên mezin were pêşvexistin."

Ayfer Duzdaş da zanîn ku rêwîtîya ber bi Arguvanê ve jî hinekî veng dest pê dike.

Duzdaş gotina xwe veng tînê ziman:

"Newayên Arxawûnê bi temayên wisan xemilandî ne ku bi awayekî giştî di civakên gundewar û siruştê de tên dîtin. Têmayên sereke jî li ser evîn û sewdayê, xurbet, mirin û veqetînê ne. Ew newayên ku ji nav jiyanê tên, di wexta çinîna giya, çûna zozanan, çêrîna pez de û di nav zêmarên li ser mirîyan de xwe bi eşkere didin der."

"Dema erdnîgarî yek be, çîrok jî dişibin hev"

Stranbêj Duzdaşê qala kilamên li Anatolîya Navîn û mijarên stranan jî kir:

"Dema erdnîgarî yek be, çîrok jî dişibin hev. Mijarên ku pir ca-

ran di civakên gund û xwezayê de têne dîtin hene. Li ser evîn, malwêranî, mirin û veqetînê tê gotin - ji jiyanê dixwe. Şînên ku li zevîyê, çinîna gîha, çûyîna deştê, çêrandina pez an jî dema mirinê têne kirin jî xwe îfade dikin. Ez muzîkjeneka jin a kurd a elewî ji Koçgirîyê me - muzîkjeneka ku para wê ji bindestî û asîmîlasyonê bûye. Ez hewl didim ku muzîkê çêkim bêyî ku xwe ji rastîya civakî ya ku ez jê têm dûr nexim. Ji ber ku tu kurd û elewî yî, tu hatiyî paşguhkirin. Rewşeke zordestîya ziman, olî û çandî heye. Li dibistanê, li kar... Va rewşa dibe sedem ku hûn xwe, derdora xwe û rastîya civakî ya ku hûn tê de dijîn, bipirsin. Dema ku ev dibe rastîya we ya civakî, lêpirsînek hundurîn dest pê dike. Vegerek heye ji bo axa ku te şekil daye. Bi tena serê xwe bûyîna solîst ji bo min ti wateya xwe nîne. Tiştê ku hûn dikin dema ku hûn bi herêmî re hevdîtin dikin, wateyekê werdigire. Di vî warî de ez heta niha li ser çar albuman xebitîm: Leylan, şînên Koçgirîyî, awazên elewîyên kurdî yên ji Horasanê heta Çorûmê û herî dawî jî kilamên Arxawûnê."

"Em bûne kesên nezan, fêm nakin, li çanda xwe nafikirin û rojane dijîn!"

"Muzîk û elewîtî di civaka elewî de bi hev ve girêdayî ne" Ayfer Duzdaşê wisa got û qala fonksiyonên mûzikê kir:

"Muzîk parçeyekî vê çandê ye. Hema bêje di her maleke elewîyan de hûn ê rastî tembûrekê werin. Helbestvanên elewî - pîr hem nûnerên dîrokî û hem jî yên çandî û hem jî veguhêzên vê çandê ne. Muzîk ji hêla fonksiyonê ve di navenda vê jiyanê de ye ku bîranîna kolektîf zindî bihêle û çand ji nifşên pêşerojê re veguhezîne. Em bûne kesên ku nizanin, fêm nakin, li çanda xwe nafikirin, rojane dijîn û tavilê dixwin. Her roj em hinekî ji rastîya xwe dûr dikevin. Guherîna bilez a jiyana mirovî ya dîjîtal û pêkhateya çandî dejenerasyona çandî bi xwe re aniye. Ji ber vê yekê ji bo min gelek girîng e ku ez gund bi gund bigerim û ji bo parastin, zindî hiştin û veguheztina tiştên kevneşopî yên ku zû winda dibin ji bo nifşên pêşerojê tomar bikim. Em hemû dizanin ku ger ev kombûna çandî neyê tomarkirin, bi her çîrokbêjekî windabûyî re ji holê radibe."

Projeyên nû

Stranbêja kurd, qala projeyên xwe yên demên pêş da jî kir:

"Bi taybetî li herêmên ku elewîyên kurd lê dijîn, ez dixwazim xebatên xwe yên berhevkirinê bidomînim. Ez ê di demek nêzik de van xebatan bi cîh bikim."

Bîranînên bi êş yên jineka rojavaya Tirkîyê

Cîhanbeylî û êşa 52 rojan
– 5–

Muzaffer Özgür

Mala te bişewite mêro!

Li deşta Anatolîyê bi tenê, bêkes û ducanî mabûm. Min a niha çi bikira? Biçûyama derîye kê? Derd û kulên xwe bi kê re parva bikira? Min gotibû „mala te bişewite mêro“, lê bi rastî mala min şewitîbû.

Min îzna xwe ya salê girt û ji Cîhanbeylîyê dûrketim. Dema vegerîyam mala bavê xwe, ew gelek şa bûn. Lê ez ne rihet bûm. Dayika min fahm kiribû ku derdekî min heye. Çend roj derbasbûn bi şûnda, min derdê xwe ji dayika xwe re eşkere kir. Ew pir eciz bû. Li ba edet û ola me nedihat qebûlkirin ku jinek bê zewac ducanî be. Wê gote min; „Tu di nav tenduristîye da yî. Çavên te kor bin, te çawa rûreşî anî serê me, bavê te bibîze ew ê bimire. Bi lêz here bajarê mezin, çareyekê ji xwe ra bibîne!“

Bi gotina dayika min, min fahm kir ku li mala bavê mayîn jî zehmet e. Çend roj derbas bûn bi şûnda, ez bi trenê çûm İzmîrê. Min serî li buroya tenduristîyê xist ku ka çawa dibe, ez cîhê karê xwe biguherim. Şert û merc gelek zehmet bûn. Lê min kesek dî ku bi pera dikanîya tayîna min ji Cîhanbeylîyê derxîne Îstanbûlê. Min qebûl kir û pere dan wî. Hemû karên min xelas bûn û vegerîyam mala bavê xwe. Hefteyek derbas bû ji Wezarata Tenduristîyê nameyek ji bo min hat. Serîlêdana min hatibû qebûl kirin û tayîna min derketibû Îstanbûlê.

Bi trenê ketim rêya Konyayê, li buroya tendurîstîya bajêr min karê xwe xelas kir û du ra bi otobosê derbasî Cîhanbeylîyê bûm. Bi rê de min hatina xwe a siftê xeyal kir. Bi eşq, kelecan hatibûm van deran, lê li van deran jîyana min li dawîyê pir giran bû. Kurd, tirk, teter, goçmanê ku ji Balqana ku koçî welat kirî, di nav hev de dijîyan. Min ji van deran pir hezkiribû. Ji bo ku xizmetî gel bikim bi fedakarî, serbilindî min kar dikir. Bi rastî wan jî ji min pir hezkiribûn. Dema di nav xeyalan de bûm, xortê di otobosê de kar dikir bi dengekî nermik gote min; „Abla, abla em

hatin Cîhanbeyliyê, kerema xwe amade bike.“

Derbasî mal bûm. Tiştê xwe yê mihûm û cil û bergên xwe tevûhev kirin û min xwe amade kir. Derbasî nexwaşxanê bûm ku xatirê xwe ji hevalan bixwazim. Dema ketim hundir, dostên min bi kelecaneka mezin ez hembêz kirim. Ji Ankarayê bi rêya faksê rewşa tayîna min ji Konyayê re, wan jî ji vir re şandibûn. Şok derbas kiribûn ku çima min ji nuşkava tayîna xwe rakiribû. Ez bûm mêvana wan hevalan. Roja din, kemasî xelas kirin û çend hevalan bi çavên şil ez birim rawestgeha otobosa û ez bi çavên şil ketim rêyaka nû.

Min biryara xwe dabû! Min a zarokê xwe bi xwe mezin bikira û mihtacî tu kesî jî nebûma. Bawerîya min bi min hebû. Karê min hebû. Perê min jî hebûn. Vegera mala bavê edî ji min ra bi zehmet dibû. Dema dayika min li çavên min mêze dikir, girî dikete qirika min. Derbasî oda xwe dibûm û min qet nedixwest kesekî jî bibînim. Bavê min dixwast em li cem hev rûnin û wek berê sohbet bikin, bikenin. Min ji wan re behsa tayîna xwe kir û got: „ji bo wê morala min xerab e. Tiştekî din tuneye.“ Xêr kirin û mesele qebûl bû. Lê dayika min ne rihet bû. Dema em li malê bi tenê bûn digote min: “Qîza min, here bajarêkî mezin dergûşê ji berxwe bigire. Tu nikanî bi tenê zarok mezin bikî, jîyan giran e tu hîn berzawac î, tu bixwazî ez jî bi te re werim. Tu êş çênabîn, metirse.“ Min xwe ji pêşnîyara dayika xwe dûr girt û qebûl nekir. Min nedikanî bûbûyama qetîlê beden û zarokê xwe. Wîcdana min ew yeka qebûl nedikir.

Roja da du hev, ji alîyekî de bi dayîka xwe re di nav gengeşîya de bûm, ji alîyê din tirsa bavê min li pişta min bû. Rojekê êvarê ji xwarinê bi şunda, bav û dayika min û ez, em rûniştin. Min got ez dixwazim ji we re tiştekî bêjim. Herduya jî bi kelecan li min nêrin. Dayika min bi çava îşmar dikir ku ez tu tiştan eşkere nekim. Min got: „Bavo, min bibaxşîne. Ez li Cîhanbeylîyê bi xortekî kurd re zewîcîm.“ Bavê min qet deng nekir! Ji berîka xwe ya îşlix cixara xwe derxist û bi hesteyê xwe yê li ser masê vêxist. Her du jî bi hêrs avêtin ser masê. Bi keser cixara xwe kişand hundirê xwe û berda. Min zanibû ku êşa wî pir giran bû. Dayika min jî dest bi girî kir. Bavê min pirsî, „Te çima xeber neda me? Me jî bextewarîya te bibîta. Mala te nekeve, keçê!“

Bavê min çend solix titûn kişandin. Wî şok derbasdikir û bi dengekî bilind: „Qîza min zewacê jî şeref û edetên xwe hene. Çir bû ku te ûsa kir?“ Min ji wan re bi derewin zewaca xwe eşkere kir. Gote wan: “Zavê we yî li Swîssre dijîye. Ez a salekê li Îstanbûlê kar bikim ku heta xet û beretên min xelas bibin û du re jî ez jî herime Swîssrê.” Bavê min pirsî: „Ji bo salekê te dikanîya li Cîhanbeylî li mala merê xwe, li ba xezûr û xasîya xwe jî bimayî! Ne gereg bû ku te tayîna xwe derxista! Min got: “Malbata wî ji ber ku ez xerîb im, zewaca me qebûl nekir. Ez mecbûr mam ku tayîna xwe derxim. Dibe kû zirar bidana min. Ji ber wê me nikanî zewaca xwe li şarederîyê jî bikin. Nika me ya olî jî miftiyê qezê kir. Dema me li şarederîyê nika xwe kir hûnê li ba me bin!“ „Qîza min, tu ji merikê xwe hezdikî û bextewarî ew têra me dike, lê zewac bi nîşan û dawetê çedibin. Te baş nekirîyê. Em ê niha çawa bi dost û cîrana re bêjin… Ma bi xêr be!“, bavê min li min vegerand.

Li alîyê din fişke fişka dayîka min berdewam dikir. Wê dizanîya ku ez, bavê xwe dixapînim. Ji destê wê tu tişt jî nedihat. Di mal de edî rihetî nema bû, bêçare bûm. Ez ji ber ku ducanî bûm, min îzna xwe dirêj kir.

Min xwe amade kir û ew roja ku îzina min xelas bû bi otobosê derketim ser rêya Îstanbûlê. Bajarekî mezin û xweşik bû, lê çavên min nedidî, li wir ji bo min jîyaneka nû destpêdikir. Bi rêyeka dûr, bi rewşeka westî gihîştim Îstanbûlê. Serlêdan û amedekarîyên xwe xelas kirin bi şunda, min li nexwaşxaneyêka mezin dest bi kar kir. Bi alîkarîya çend hevalan, lojmaneka biçûk raxist. Di nexwaşxana min de hevaleka min hebû, ew hemwelatîya min bû û êbe bû. Wê, alîkarî min dikir. Em bûn hevalên hev. Dem dem dihata mala min û ez jî diçûm ba malbata wê. Wê digote min: „Te kîlo girt li Îstanbûlê.“ Em dikenîyan. Lê rast digot! Carcaran kêmasîyên mala min baxçewanê nexwaşxanê dikir. Ew kesekî bê deng û belangaz bû. Çend sala ji min mestir bû û digote min: „Ez bi tenê me.“

Rojekê min rewşa xwe ji hevala xwe re eşkere got. Gelek pê êşîya. Soz da min ku qet tu cîha nebêje û rewşa min di nav me de bimîne. Kesê li lojmanên me karê baxçewanî dikir û carcaran jî alikarî min dikir. Wî rojekê hat li derîyê min xist. Gote min: „Mêrê te tuneye! Tu nikanî li vî bajarî

bi tenê bijî, ez bi tenê dijîm, were em bizewicin.“ Min, ew gotina wî qebûl nekir. Roja din min rewş ji hevala xwe re got. Êvarê hevala min hat ba min. Gote min: Teklîfa wî qebûl bike! Em bi hev re pê re xeber bidin, rewşa te jî eşkere bêjin, eger qebûl kir pê re bizewice û ji vê rewşa bêkesbûnê xelas bibe.“ Ez tirsîyam lê bê çare bûm. Dibe ku bigota erê! Roja din me banî wî kir û eşkere pê ra deng kir. Got: „Ez bê kes im em ê bibin malekê û ez ê li te jî mêzekim.” Şerta min ew bû ku, ewê bi min re zewaca resmî bikira û li me xwedî derketa. Wî qebûl kir. Di çend rojan de me zewaca xwe li şaredarîyê çêkir. Em derbasî lojmaneka, maleka mezin bûn. Me kêmasîyên xwe temam kirin.

Mêrê min kesekî nezan bû. Min jê ra her tiştek eşkere dikir. Ji bo karê xwe camerek bû. Ji dar û heşinahîyê gelek hez dikir. Tekilîya me jî baş bû. Lê ji ber ku min pirtûk dixwandin, wî fedî dikir. Her êvarê li ber tv rûdinişt. Me herduya jî sibê kardikir û êvarê li mal bûn. Karê malê jî li ser min bû, wî qet alîkarîya min nedikir. Carcaran diçû qahveya mehela me. Êvarekê dereng serxeş hate mal. Erişî min kir û bi çend kutan li min jî xist. Ez revîyam ketim oda xwe û min derî kilît kir. Qet xew nekete çavên min. Ev rewşa nû bû. Xwebixwe girîyam. Ev çi qeder bû, min fahm jî nedikir. Êdi di mala me de rihetî nema bû. Herroj êvarê diçû qehvaxana mehela me. Dema dihat jî serxweş bû.

Zikê min jî mezin dibû, ducanîya min xûya dikir. Li kar hevalan destên xwe ser min re digirtin, min pir kar jî nedikir. Çend meh derbas bûn, min îzina zayînê girt û li mal mam û amadekarîyên xwe kir. Hevalan dihatin serilêdana min dikirin. Carcaran xarin û vexwarin ji min re ji nexwaşxanê dianîn. Kontrolên min jî hevala êbe bi xwe dikir. Ew roj hat, êşên min giran giran destpêkirin. Min xeber da hevalên xwe. Ew hatin û ez birim nexwaşxanê. Dem hat û bi alikarîya heval û doxtirê xwe bi çavên şil, êş û xeyalên mirî keçikek anî dinê. Dema qeyîdê min got navê xwe ……..…ye. Navê bavê xwe …………..…Ew agahdarî ketin nav qeyîdên dewletê.

Reşikek bû. Li bavana kişandiye! Lê bav tunebû. Çend roj derbas bûn, hatim mal. Lê nifûs gereg bû, qeyîd gereg bû. Bav li ba me nebe jî, kaxiz gereg hebûyana. Mêrê min qebûl nekir ku ez li ser wî qeyît bikim. Çend rojên bi şorê giran û heqeret bi şunda min biryar da ku herim Cîhanbeylîyê û malba-

ta wî malşewitî re deng bikim, da ku wan ew li ser nifûsa xwe qeyît bikirana. Min keçika xwe kir paşla xwe û bi trênê derketim ser rêya Konyayê. Derbasî Cîhanbeylîyê bûm û çûm dûkana hevalê wî. Min ji wî ra hekat eşkere kir. Ez bi otomobîla xwe birim gund. Em li bermala wan sekînin! Çi zehmet bû ew roja, nikanim ji te re bêjim. Malbat derkete derva, em birin hundirî malê. Dema min hekata xwe ji wan re got, gelek aciz bûn û heqeretî li min kirin. Ez kirim orispi, xwe berdan min. Ew kesê ji qezê ket navber û em bi zorê ji mal derxistin. Min gote wan; „Ez a herim qezê û we bidim mehkemê. Lawê we bavê qîza min e.“ Ew gelek tirsîyan.

Em çûn ber mala mixtarê gund. Dema mixtar rewşa min bihîst, ew gelek xemgîn bû. Alikarîya min kir. Gote min: „Ew bêşeref in qîza min, ez alîkarîya te dikim.” Em çûn nifûsa qezê, mixtar kaxiz çêkirin dan nifûsê û qeyîda keçika min ya resmî li ser navê bavê çê kir.“ Min destê mixtar maç kir û vegerîyam Îstanbûlê.

Min a çi bikira? Him kar û him jî keçikê mêzekirin çawa dibû, min nedizanî. Mêrê min jî serxweşek bû. Ditirsîyam ku ew ê tiştekî hûne serê me. Şev û roj bi tirs, bi pirs û bêçaretîyê re bê derman mabûm, xew di çavên min de nema bû. Jîyan ji bo min pir giran bûbû. Tendirûstîya min jî xerab bûbû. Malbata min jî ez jibîrkiribûm. Bêkes, bêdayik û bêbavik mabûm.

Keçika min bû yek meynî. Dema ez pê şadibûm, mêrê min eciz dibû û digote min: „Weledzînayê kê ye em nizanin!“ Di navbera me de şer çêdibû. Min nedikanî hêza xwe bidim ser hev û wî ji malê derxînim. Tirsê ez nexwaş kiribûm. Doxtira dermanê xewê dane min lê keçika min hebû. Roj bi êş derbas dibûn. Min giran giran paqijîya malê û karê din nedikir. Mêrê min jî her êvarê arak vedixwar.

Keçika min bû 45 rojî. Mêrê min gote min, „tu nikanî li dergûşê xwedî derkevî. Baştir e em wê bidin dewletê. Ma çend salan li mala dewletê bimîne. Tu baş bûyî em ê helinîn ba xwe.“ Min peşnîyara wî bi hêrs red kir. Ji alîyê din de ji min re nameyek hatibû ku heta du heftan gereg bû ku ez vegerîyama ser karê xwe. Min ê çi bikira, min nedizanî. Wan rojan her şevê li mala me şer hebû. Mêrê min ez kut dikirim ku em çima keçikê nadin dewletê.

Ew roja hat. Keçika min bû 52 rojî. Ew bûbû xezalekê. Mêrê min em helnan birin buroya dewletê ku

em keçikê teslimî wan bikin. Min ha ji xwe nebû. Wî deng dikir. Li dawîyê me keçik teslimî dewletê kir. Kaxiz û cil û bergê wê jî danê.

Çend roj derbas bûn, min nedikanî wek dayik bê wê bijîyama. Min dermanên giran vedixwarin û radiketim. Deh roj derbas bûbûn, min xwast herim keçika xwe bibînim û helinîm, bînim mal. Lê felekê nexwast. Keçika min tunebû. Bi wan kaxiz û beratan qeyîd jî nehatibû kirin. Ez bi girî derketim derî xanîyê dewletê. Va çi felek bû ku ji pîstê min nediket. Ez çûm polîs min rewş bi nameyekê eşkere kir. Wan gote min, ew ê lêkolînekê çêkin û min agahdar bikin. Ez roja din dîsa çûm daîra dewletê, min kesek dî û pere dan wî. Wî kesî gote min, „Xûşka min, tu nikanî zaroka xwe bibinî. Malbateka pir dewlemend keçika te girtin, birin. Ew a di rewşeka pir baş de mezin bibe. Ji ber we jî tu qeyîd dernakevin. Her tiştek tunekirin, here mala xwe. Min van gotinan jî ji te re negotin!“ Dinya li ser min hatibû hev. Ez dîn bûbûm. Keçika min ku min jîyana xwe pê tunekiribû, li ber çavên min li welatê min, li bajarê Îstanbûlê wenda bûbû.

Ez nexwaş bûm. Mêrê min li mal zilm li min dikir û paşê ez berdam û ez li derva mam, ketim nexwaşxana. Dewletê ez ji ber nexwaşîye tekawût kirim. Di masarosman de bi salan raketim. Niha rewşa min bi dermana piçekê baş bû. Hevaleka min li min mêzedike û ez perê xwe didim wê.
Dizanî Konyali, ew êşa 52 roja ji canê min qet derneket.

…………

Spas ku te hekata xwe ji min re eşkere kir. Pir xemgîn bûm. Ez ê wek rojnamewanekî ji kurdê Anatolîyê hekata te binivsînim. Ma tekilîya me berdewam be. Em dikanin bi rêya telefonê xeber bidin.

*Nezî salekê me bi rêya telefon sohbet kir, rewşa xwe ji ber dermana giran bûbû. Hevala w*ê jî *ez agahdar dikirim. Daxwaza me ew bû ku em keçika wê bibînin, l*ê nebû nasîb.

Ew jina bextreş di 61 salîya xwe de bi korona ket, di meha hezîrana 2021an de li nexwaşxaneyeka taybet de vafat kir. Mirin, ma mala te bişewite!

*Pirsek hebû ku min bersiva wê qet nedî. Gelo kê ew biribû nexwaşxanê? Ew sê kesên hatin, ew ji mal girtin û bi ambûlenseka taybet birin nexwaşxan*ê kî bûn?

Ma keçika em li ser şopa wê digerîn nebe! Eger ew be, ew niha li ku ye?

Dawî

TEQE Û RO -1

Adem Özgür

Saet dev devê siwê bû. Dengê deriyên hesinî, qîreqîra pawanan û nalenala girtîyan dihate guhên min.

Jixwe wê şevê xew neketibû çavên min. Derîyê qawûşa girtîgehê vebû. Qawûş di binê erdê de, yeka biçukû dirêj bû. Di hundir de şeş ranza, tiwaletek, serşokeke piçûk û eqeyeke piçûk jî hebû lê ji ber ku qawûş li jêr bû ew teqe li jor dima û tu fêdeya wê bo hundir tunebû. Bi dengê derîyê qawûşê re, du pawan ketin hundir, li doralîyê mêze kirin, paşê navê min hildan û ji min xwestin, ez di nava nîv saetê de xwe amade bikim. Di qawûşê de saeta me tune bû, lê min li teqeya ku li jor dima mêze kir hêj ro hilnehatibû, wext hê zû bû. Li aliyekî min xwe zû bi zû amade dikir û li aliyê din jî min xatirê xwe ji hevalên xwe yên qawûşê dixwast. Rêyeke dirêj û nedîyar li pêşiya min bû. Dibe ku careke din ez hevalên xwe nebînim û wisa jî bû.

Wext temam bû, dîsa derîyê qawûşa girtîgehê vebû. Vê carê çar pawan ketin hundir, her dera min kontrol kirin, kincên min mêze kirin û bi dengekî nexweş gotin: “Haydê derkeve!”

Ez di nava çar pawanan de ber bi deriyê girtîgehê ve diçûm. Min

cara dawîn li paş xwe mêze kir û hêvî dikir ku dê hevalên min jî di rojên pêş de ji vir xilas bibin.

Li ber deriyê girtîgehê neh-deh leşker li hêvîya me bûn. Ewê di vê rêya dirêj de refaqatê me bikirana. Piştî pawanan, carek jî leşkeran li ser piyan em kontrol kirin, navên me pirsîn û dixwastin ji me jî bibihîsin ka “sûc”ê me çi ye.

Piştî kontrol û pirsên li ser piyan em birêketin. Di minibûsa girtîgehê de hema bibêjim her cure sûcdar hebûn: Hin ji wan diz, hin kûjer, hin jî tiryakfiroş bûn.

Cemsa girtîgehê bi pênc-şeş hesinan hatibû veqetandin. Di her aliyê de du-sê kes diman û ez jî bi du xortên amedî re bûm.

Her du xort ji ber tiryakfiroşiyê hatibûn girtin û niha li rêya dadgehê bûn. Di rûyê wan de tu poşmanî û tirs tunebû. Heta şûna ku em herin qala serpêhatiyên xwe yên tiryakfiroşî û diziyê dikirin. Bi kêfxweşî qala rojên xwe yên berê, qala zarokatîya xwe dikirin. Xortên kurd ji ber neçarî, bêperetî ketibûn rêyên şaş û wê dewleta tirk li hember wan biryara xwe bidaya. Jixwe ne wisa bû? Bi mîlyonan kes ji welatê xwe dûr ketibûn; tî mabûn, birçî mabûn, kar nedîtibûn. Loma jî hinekan ji wana dest bi diziyê, paşê jî dest bi tiryakfiroşiyê kiribûn.

Rêya me dirêj bû. Ez qet neçûbûm Amedê, ji ber vê yekê ye ku çîrokên wan ên li ser Amedê mêla min dikşand, heta rêya me xilas bibe, min wan guhdar dikir.

Qey min qet deng nedikir? Na, belkî min nedixwast ji wan re “sûc”ê xwe bibêjim. Li kêleka sûcê wan, yê min sivik dima…

***

Dengkirina wan a li ser demên borî qet teva nedibû. Ji hêleke ve dikeniyam, ji hêleke ve pê diêşîyam û ji hêleke ve jî li ser halê xwe difikirîm. Ka wê çend saetan bi şûnda, çi bibûya?

***

Di cemsa girtîgehê de jî teqeyek piçûk hebû û ew jî mîna ya hepsê li jor bû. Ez rabûm ser xwe, min li doraliya xwe mêze kir û di teqeya biçûk de bala xwe da royê.

Erê, ro. Ev çar meh in min ro nedîtibû û niha li ber çavên min wek dinyayekê dixûya. Di girtîgehê de derketina dermalê ji me re qedexe bû û me nedikarî li rojhilat û rojavayê mêze bikira. Ji ber vê yekê ro dilê min xemiland.

Min nîv saetê li ro mêze kir, paşê li şûna xwe rûniştim û ketim xeweke kûr.

Mehmedî Mamê

Bilûrvanê bi nav û deng

Hızır Akbina



Mehmedî Mamê di salên 1890î de hatîyê dinê, lawê Mam î Silê, Mam î Silê Nêvîyê Alî Kalê. Alî Kalê ji ber şerê Nizipê bi birayê xwe Us û xanga xwe Fatê va revîyane û hatine Xelika (Qerecedaxê) û li vir bi cîh bûne. Alî Kalê ji Xelikan ra pir salan mixtarî kirîye. Çend salan bi şiva Silê Alî Kalê (Bapire Mehmed) bi çend malbatên celikî va gundê Hesarê ava dike. Mehmedê Mamê, Bavê xwe Mamê Silê, dayika xwe ji Kırkpınar-Celika Fadîma Bêzê ye.

Mehmedî Mamê li van gundên me mîrovekî bi nav û deng bû. Oda wî ji mêvan û xerîban re her dem ji hev bû. Kesên ji der dihatin gund (koşkar, berber, firoşkar, dengbêj, karker) gîştik li oda wî diman. Wî 25 salan ji gundê Hesarê ra mixtarî kir.

Camêrekî li ser xwe bûye, di salan 1945-1950î de hukmê leşkeran li welat pir bûye. Qerekol jî li gundê Altilerê bûye. Leşker dihatine Hesarê û çend rojan li oda wî dimane û rewşa gund mêze dikirine. Êvarekê dema cemata wî li oda wî hatiye ba hev, leşkerekî di nav cematê de lingên xwe dirêj kirine û Mehmedî Mamê bi pîna

xwe li leşker xistiyê û jê re gotiye: “Bêterbiyê tu di nav cematê de yî xwe berhev ke.” Ew gotina û camerîya wî di nav gund û gundan de belav bûye.

Rençberekî baş bûye, di bax û bostanê xwe de sebze-pilpincar dirişandîye û li cîranê xwe belav dikiriye.

Bilûrvan Mehmed

Apê Mehmed ji kurikîya xwe da hewasê xwe li ser bilûrê hebûye. Bi bilûreka biçûk dest bi lêxistinê kiriye. Di dema xwe de bûye bilûrvanekî mezin. Dema wî bilûr digirtîye; lênedixistîye mînak deng, can û nefes didayê wê. Dema wî ziravek ledixistiye, ew hekata zirave tanîye hemberê me. Ji dengê Êma Hemê kilamên Gordoyê gundê Celika tanîn pêş çavên me. Êma Hemê di kilameka xwe de gotiye:

Rê ji dî ya nare dî ya
Gordoyê min hespên xwe diçerandin
Yanî rê da li qîya zavîyan de
Çûn hevsaran hespên Gordoyê min anîn
Yên mîna kincên kuştîya.

Di kilameka din de jî Êma Hemê digot:

Mala bavê min li ûca
Di ortê de dîrege tûnca
Heq sahibî hatîye heqê xwe dixwaze
Tê bigota ji te berjêr xûdanê sûca

Kilamên kurmancên dor gola xwê û yên şêxbizinên deşta Haymanê, yên dengbêjên hetanî deşta Anatolîyê, yên radyoya Erîvanê, yên radyoya trt lêdixistine. Çi kilam ji ku bihistibin bi kurdî an jî bi tirkî gîştik bêyî kemasî lêdixistine.

Nevîyê wî Miço

Kalê min guh dida ejansa li ser radyoyê. Dû ajansa re digot; "Miço yawrim, kîjan kilam derket ez ji te ra wê kilamê bi bilûrê lêxim. Malbata me ji kilaman pirtir li bilûra apê Mehmed guhdarî dikir.

Li nav çend gundan Apê Mehmed

Kırkpınar: Mehmedî Mamê xarzîyê Celika-Kirkpinarê bû. Kirkpinarê him ji însanetîya wî, him jî awazê bilûra wî pir hez dikir. Xelkê gund mîna herin konserê radibûn diçûn Hesarê bilûrê Mehmedî Mamê guhdarî dikirin. Yan jî ew carcaran dihate Celika, xalanê wî, ew teme dikirin, "digotin bê bilûr mê!" Wexta ew hat, hema koşa odakê hazir dikirin li gor wextê bi du, sê seetan ew bernedidan.

Kozanlı, Doğutepe,Yaraşlı çend gundên din yên tirkan:

Li van her du gundan navê wî qevalci bû. Zevî û zîyanê xwe radikirin bi şûn va dihatin qavalci dibirin, dikirin mêvanê xwe, heftekî li dor wî dicivîn û bilûra wî guhdar dikirin.

Ji Kozanliyê A. K: Em wek çend ciwan ji bo xizmeta mezina bikin diçûn oda gund. Di rojên wek her dem kesekî ji me nedixwast here Odê. Lê, dema qewalci dihat ciwan diketin kelecanekê, daxwaz dikirin herin xizmeta oda gund bikin. Wan rojan xwarinên xweş dihatin amadekirin. Mezinê me bi bilûra wî û bi sohbeta wî re dem bi kefxwaşî derbas dikirin. Dema wexta çûyîna wî dihat, li ber derî an jî li kêleka malê 1-2 seetan ji bo jinan an jî ji bo xort û kurikan li bîlûrê dixist. Ji kesekî daxwaza tiştan an jî peran nedikir. Lê roja ew here gundê xwe erebe dihat amadekirin. Nîsk, nok, genim, ce ji mala tanîn, ji dûkana gund jî loqim, biskût, şekir, fistik, çay, tûtin tanîn li ereba wî ya ku pê bibin gundê wî bi kelecanê bar dikirin. Mîvanê qedirbilind dibirin gundê Hesarê.

Xelika-Qerecedax:

Jênerasyona Qerecedaxê ya 68an, ji Apê Mehmed pir hez dikirin. Dihatin zîyaretîya wî, bi bilûra wî qeset tiji dikirin. Carcaran di-

hatin Mehmedê Mamê dibirin, bilûra wî guhdar dikirin.

Konsera Mehmedî Mamê ya Mezin
Li Xelika, di sala 1972an meha Tebaxê de daweta nevîyê wî Mehmed hebû. Ji Qerecedaxê re va firsendeka mezin bû. Xortên gund li vira komek çêkirin. Hatin du rojan pêşta Apê Mehmed birin. Wî ji mezinê wan re lêxist. Roja dawetê li ber şewqa hîvê, li ber lambên lokisan Mehmedê Mamê 4,5 seetan konsereka mezin da. Bi qasî 1000 kesî konsera wî temaşa kir. Li ser xanîyan, çardaxan ew bêyî solix guhdarî kirin.

Li ber daweta Mehmed nanê bûkê, ku bûk derket bi şûnda datînan. Li dawetê Apê Mehmed gotiye; "wexta min tineye, hûn ê nanî bûkê rojê henê dînin." Li Qerecedaxê va bû edet. E din li vir nanê bûkê rojê henê datînine.

Bê şirove!

Ji Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî de tarifeka kurdan, rûpel 66

"…. Eger rewşek kurdan a xirab hebe, ew jî ew e:

- ***ku kesek ji kesekî din re serî danaxe, ji hev re nayên kemendê û her wekî lib û lib herkes fikir û serbilindîya xwe dike.***
- ***Bi hev ra fikra bi serbilindîya muşterek nakin.***
- ***Pişta hevûdu nagrên û nabin yek.***

Di derheqê vê rewşa wan a nebaş de, mamostê zana, Mewlana Se´deddîn ku mamosteyê (muderris) Sultan Murad Xan bûye, di dîroka bi tirkî de ya bûyer û serpêhatîyên osmanîyan a bi îbareyên payeperz û xweşik nivisandîye, li ser kurdan jî sekinîye û di derheqê karekter û afirandîniya wan de wiha dibêje:

- ***Her kurdek bi xwe bi serê xwe li gor kêfa xwe ala jiyana ferdîdiyê bilind kirîye û di nav wan çîya û gelîyan de bi serbestî dijî.***
- ***Eger em warê yekgirtin, hemfikrî û hevkarîya wan a bi hev re binêrin, em dibînin ku tenê di kelîme-î şehad de, ya ku di musûlmantîyê de yekbûna Xwadê îfade dike nebe, qet li ser tiştekî din tifaq di navbera wan de tune.***



99 GOTİNÊN Albert Einstein

Wergera ji zimanê almanî:
Nuh Ateş

1. Wateya jîyanê ne ew e ku meriv tê da serkevtî bibe, ango diwê berketî bibe.
2. Meriv qet nikane pirsgirêkan bi eynî fikirînê çareser bike ya ku bûye sebeba çêbûna wan.
3. Fantazî ji zanînê giringtir e, ji ber ku zanîn bi sînor e.
4. Çetinayîyên te yên bi matematikê va ji xwe ra neke xem. Ez dikanim garantî bidim te ku yên min hîn zedetir in.
5. Tarûmarkirina pêşhukimekî ji ya atomekê bi zehmetir e.
6. Du tişt hene bê dawî ne, gerdun û hişkêmîya însanan, lê ji ya gerdunê ez hîn rind ne bawer im.
7. Di jîyanê da tiştên herî baş ne ew in ku yên meriv bi pereyan bi dest xistîye.
8. Qebilîyeteke min ya xas tune, lêbelem ez î pir bi meraq im.

9. Eqlîselîm komikeke ji pêşhukiman yên ku meriv hetanî 18 salîya xwe komkirî ye.

10. Ez ne emîn im ku di şerê dinyayê sêyemîn da kîjan silehên bihên bikaranîn, lêbelem di şerê dinyayê çaremîn da ewê bi ço û keviran şerê hevûdu bikin.

11. Jikî ku matematikvanan destavêtine teorîya relatîvîtet ez bixwe wê êdî wî fehm nakim.

12. Tenê du cûreyên jîyînê hene. Yan ûsa mîna ku qet tiştek ne harîqa ye yan her tişt wekî harîqa ye.

13. İlim tiştekî harîqe ye, eger meriv ne mecbûr bibe ku dewara jîyanê bi wî bike.

14. Yê ku rastîya di tiştên piçûk da cidî negire, meriv nikane ya di tiştên mezin bawerîya xwe bi wî bîne.

15. Yê bi aqil ew e ku tiştên bi zehmet hêsan dibêje.

16. Eger meriv bi dirêjîya du seata bi keçikekê va rûniştibe, meriv dibêje qey ev deqiqeyek bû. Lê eger meriv deqiqeyekê li ser zobeyeke germkirî rûniştibe, ew bawer dike ku ew du seat bûn. Belê, ew relatîvîtet e.

17. Dinya ne ji ber merivên xerabkar, eksine ji avûrûyê yên ku rê didin xerabkarîyê di tehlukê da ye.

18. Li ber xwe bide ku tu yê/ya ku jê hez dikî bidest bixî, wekî din tu mecbur î ji yê ku bidestteketî hez bikî.

19. Di nava çetinahîyan da derfet hene.

20. Jîyaneke ku berî her tiştî armanca wê bicîhanîna ihtîyacên şexsî ye, zû yan dereng dibe heyalşikestîneke tahl.

21. Şabûna ji lêmezekirin û fehmkirinê bedewtir dîyarîya tebîete ye.

22. Hînbûn tecrube ye. Her tiştê din tenê agahdarî ye.

23. Tiştê herî bedev yê ku bihê serîyê me, ewê ku wateveşartok e.

Berdewamî heye

Hişmendiya dîndar

Ecevit Yıldırım

Li gor încîla Barnabasê, rokê komeke qelebalix ya Yahûdîyan, bi porê jineke gunehkar digrin, wê bi xwe re dikşînin û tînin cem Hz. Îsa. Ew ji Hz. Îsa daxwaz dikin ku fermana recm û kevirkirina jina gunehkar li gor şerîeta Hz. Musa bide. Hz Îsa xwar ve tê û li erdê daîreyekê xêz dike. Daîreya ku Hz. Îsa li erdê xêz kirî bi qudreta Xuda dibe hanêynik. Gava koma qelebalix ya Yahûdîyan li nêynikê dinêrin, tê de hemû gunehên ku heta wê rojê kirine, dibînin. Hz. Îsa ji erdê radibe û ji qelebalixê re dibê: „Jinikê berdin! Kî di nava we de bêguneh be, bila kevirê yekem ew bavêje.“ Gava Hz. Îsa berê xwe ber bi koma qelebalix ya Yahûdîyan dike, dibîne ku xêr ji jinikê kes nemaye û koma qelebalixa Yahûdîyan gî ji wir reviyaye.

Di eslê xwe de, çîrokeke ku di şexsê Hz. Îsa de bi rastî hatiye jiyînê, yan ji efsaneyeke hîn kevintir ku li gor karekterê Hz. Îsa hatiye çêkirin, nayê zanîn. Lê

belê di her halî de ev çîrok, ji bo analîzkirina helwest û tevgerên merîyan minakeke girîng pêk tîne.

Hişmendîya Dîndar bi nêzikbûneke sivik, çîrokê ji hêlekê ve li ser pêxemberbûna Hz. Îsa û girêdayîyên wî, bi fezîleta wî û ji hêla din ve jî li ser piçûkxistina koma Yahûdîyan dinirxîne. Halbûki gava çîrok bi aqilekî rasyonel û li gora şertên wê demê bê nirxandin, divê bê qebûlkirin ku koma Yahûdîyan li gor bîr û bawerîya xwe tevgeriyane.

Ya ku di çirokê de ezberê xera dike, helwesta Hz. Îsa ye. Wek kesekî ku di hundirê nasname, bawerî û edetên Yahûdîbûnê de jidayikbûyî, ew bi aqil tevdigere û humanizmê derdixe pêş. Girêdayî wê yekê ji bîr, bawerî û edetên Yahûdibûnê yên derveyî mirovatîyê red dikin.

Di vir de pirsa ku bê kirin ev e: Gelo ya ku Hz. Îsa ji însanên din vediqetîne û sedema ku ew helwesteke humanîst nîşan dide, çi ye?

Nirxandina Hişmendîya Dîndar ya ku Hz. Îsa ji ber pêxemberbûna wî xwedî fezîlet qebûl dike, ne pêkan e ku rast be. Ji ber ku, gava çavkanîyên olî referans bên girtin jî, diyar e ku pêxember jî wek însan (hevwate: beşer: însan) tên qebûlkirin û ew jî mîna însanan dikarin şaşîyan bikin.

Gava di cenetê de Şeytan Hz. Hewayê û Hz. Adem dixapîne û ji dara ku ji hêla Xuda ve hatibû qedexekirin sêvê dixwin, mijar bê ku niqaş li ser bê kirin, zelal dibe.

Ji xwe gava helwesta humanîst ya Hz. Îsa bi pêxemberbûna wî ve bê girêdan, ji ber ku ne pêkan e hemû însan bibin pêxember, lêgerîna bersiva vê pirsê li cihekî din, divê ji xweberê bê famkirin.

Di vê niqteyê de, gava mijar li ser trîplisîteya felsefîk ya felsefevan Ducane Cundioxlu ku dibê; "Ez wek însanekî ji dayîk bûm, paşê bûm Tirk, paşê bûm Misilman û niha jî hewl didim ku dîsa bibim însan." ya bi navê Nasname - Kesayetî - Xwebûn bê xwendin, mijar ê bi giranî zelal bibe.

Nasname:

Taybetmendîyên ku însan bi jidayîkbûnê û derveyî îradeya xwe werdigre, nasnameyên wî pêk tînin. Însan ne dê û bavê xwe, ne

malbata xwe, ne zayenda xwe, ne gundê xwe û ne jî etnîsîteya xwe dikare hilbijêre. Ev nasnameyên ku însan derveyî îradeya xwe wergirtine, ne pêkan e ku bêne guhertin. Ev nasname ne cihê meziyetê ne. Lê ji bo herkesî çavkanîya heysiyet û şerefê ne. Bi înkarkirina wan merî ji şeref û heysiyeta xwe dibe.

Kesayetî:

Taybetmendîyên kodên genetîk ku însan bi jidayikbûnê û taybetmendîyên ku bi jidayikbûna di hundirê malbatekê de û ji derdora kulturî yên wek bawerî, edet, karakter, xuy û hîskirinê werdigre, kesayetîya insên pêk tînin. Bihurîna ji nasnameyê ber bi kesayetîyê, di her însanî de di nav pêvajoyeke xwezayî de ji xweber pêk tê. Kesayetî di hundirê xwe de nasnameyê jî dihewîne.

Xwebûn:

Xwebûn cewhera ku di hundirê mirov de ye û asta mirovatîyê pêk tîne.

Ji bo ku mirov bikaribe helwesteke exlaqî nîşan bide, divê ew xwe bigihîne asta mirovatîyê, ya ku di hundirê wî de ye. Ji bo ku mirov xwe bigihîne asta mirovatîyê ya ku Cundioxlu wek Xwebûn bi nav dike, divê mirov aqilê xwe bi kar bîne û bi nasname û kesayetîya xwe re hevrû bibe.

Ku em vegerin ser mijara Hz. Îsa û jina gunehkar: Hz. Îsa ew helwesta humanîst ne ji ber ku ew pêxember, kurê Xudê, yan jî ruhê pîroz e, nîşan da. Bilekîs, ji ber ku Hz. Îsa aqilê xwe bi kar anî, cesareta hevrûbûna bi nasname û kesayetîya ku tê de ji dayik bûye nîşan da, loma wî karî helwesteke humanîst nîşan bide.

Eger Hz. Îsa li gor qeîdeyên bawerîya Yahûdîtîyê tevbigeriya, divê bi tevî koma qelebalix ya Yahûdîyan jina gunehkar kevir bikira.

Helwesta koma qelebalix ya Yahûdîyan

Berî hertiştî divê bê diyarkirin ku Hişmendîya Dîndar ne hişmendîyek e ku li dû tiştan bipirse. Ew hişmendîyek e ku xwe dispêre bawerkirin û îtaetkirinê. Ji bo Hişmendîya Dîndar re ya bingehîn ev e ku bawerîya xwe bi Xudê bîne û bibe qûlekî îtaetkar.

Ji xwe peyvên rab û qûl, yên ku him di Quranê de û him ji

di Tewratê de derbas dibin, di kurdî de tên maneya efendî û kole. Hişmendîya Dîndar ku xwe wek qûl, yanî kole û Xudê ji wek rab yanî efendî qebûl dike, di hundirê xwe de taybetmendîyeke hiyerarşîk jî dihewîne. Gava xwe li emrên Xudê negirt, wer bawer dike ku ew ê ji hêla Xudê ve bi şiklekî herî giran di cehnemê de bê cezakirin.

Ji ber taybetmendîya xwe ya hiyerarşîk, vê yekê wek tiştekî xwezayî qebûl dike. Loma gava ew ji kesên berjêrî xwe dibine û kesên li gor bawerîya xwe derveyi rêzê dibine, cezakirina wan kesan jî wek tişteki xwezayî qebûl dike.

Di vê çîrokê de, ji ber kesê ku bê cezakirin jin e, rewş bêhtir girantir dibe. Lewra ji hêla Hişmendîya Dîndar ve, jin ti car wekhev nehatiye qebûlkirin.

Her wiha, ji ber ku li gor bawerîya Hişmendîya Dîndar Hz. Hewa ji parsûya Hz. Adem hatiye afirandin, ew jinê wek parçeyek ji bedena mêr, yan jî wek metayek ku mêr lê bibe xwedî qebûl dike.

Ger Tewrat wek referans bê qebûlkirin

Hişmendîya Dîndar fatûraya ku Hz. Adem û Hz. Hewa ji cenetê têne qewitandin jî, di şexsê Hz. Hewayê de li jinê dibire. Ji ber ku gava Şeytan di cenetê de Hz. Hewayê dixapîne, Hz. Adem jî bi gotina Hz. Hewayê dike û ji dara ku ji hêla Xudê ve hatibû qedexekirin sêvê dixwe, Hz. Hewayê wek berpirsiyar û sûcdarê esas yê wê yekê qebûl dike.

Xala esas ya vê çîrokê ew daîre ye, ya ku Hz. Îsa xêz kiribû û veguherîbû nêynikê.

Yahûdîyên ku di wê nêynikê de mecbûr mabûn bi guneh û realîteya xwe ve hevrû bin, ew mecbûr kirin ku tercîhekê bikin. Yahûdîyên dîndar dikarîbûn wêrek tevbigerin û helwesteke layiqî heysiyeta mirovatîyê nîşan bidin. Lê belê Yahûdîyên dindar tercîha xwe ji hêla revîna ji cihê bûyerê kirin.

Ji xwe helwesteke cûda ji ne pêkan bû, ku meriv ji Yahûdîyên dîndar hêvî bike. Herwiha divê bê ziman, gava emrên xudayê ku Hişmendîya Dîndar pê bawer dike bi cîh nehatin, şewitandina

di nav agirê cehnemê de ji Hişmendîya Dîndar re dibe cîhê xeterê. Loma Hişmendîya Dîndar hişmendîyeke tirsonek e.

Prensîp û sinorên aqilê wî, ne wî bi xwe, ji hêla bawerîya ku ew tê de ji dayîk bûye û ji hêla Xudayê ew pê bawer dike, hatine diyarkirin.

Her çiqas di Quranê de qala hizirkirinê bê kirin jî, qesta ji wê yekê hizirkirineke bi sinor e. Hizirkirineke ku çarçoveya wê ji hêla Quranê ve hatiye diyarkirin û erêkirina teza ku Quran diparêze, tê qestkirin. Bi gotineke din, hizirkirin, hizirkirina ku di Quranê de tê qalkirin, ne hizirkirineke azad e ku bikaribe bê sînor bifikire û tezên nû û zanistî derxe holê.

Di eslê xwe de, bi taybetî jî dînên semawî ji hizirkirinê hez nakin. Li gor wan, kesê ku cara siftê hizir kirî û di encama wê de jî li hember Xudê serî hildaye, şeytan e. Mirov dikare bi dilekî rihet bêje, Şeytan di encama hizirkirinê de bû sembola xerabîyê.

Ji ber ku Şeytan derbasî pêşîya Xudê bû û pê re gotibû: „Te Adem ji xwelîyê û ez jî ji agir afirandim. Loma jî ez di ser Adem re me. Madem ez di ser Adem re me, çima ez li ber wî secde bikim?“ Di eslê xwe de bi pirskirina vê pirsê, Şeytan ji sînorê hizirkirinê derbas bû û bû sembola xerabîyê. Bi gotineke din, ji ber ku Şeytên cesareta pirskirin û hizirkirinê kiribû hatibû lanetkirin, ji cenetê hatibû qewitandin.

Bi gotineke din cesareta hizirandineke bingehîn û azad ji bo Hişmendîya Dîndar ne pêkan e. Ji ber ku wê demê ew tê wateya ku Hişmendîya Dîndar û Şeytan li ser heman niqteyê digihîjin hev.

Di vê çîroka li jor de, ya ku Hz. Adem û Hz. Hewa ji cenetê hatine qewitandin, Hişmendîya Dîndar wer bawer dike ku Hz. Adem û Hz. Hewa ji hêla Şeytên ve hatine xapandin.

Lê belê Hişmendîya Dîndar ne dikare şik bibe û ne jî dikare cesaret bike û bipirse, berî ku Şeytan Hz. Adem û Hz. Hewa di cenetê de bixapîne, Şeytan ji hêla Xudê ve hatibû lanetkirin û ji cenetê hatibû qewitandin. Şeytanê ku ji hêla Xudê ve ji cenetê hatibû qewitandin, bi çi şiklî û çing vegeriya cenetê?

Herwiha Hz. Adem û Hz. Hewa sûcdar bin jî, pirsa cezayê

wan çima li bi mîlyaran însanên ku eleqeya xwe bi sûcê wan tuneye tê birîn jî, nikare cesaret bike bipirse. Loma, ji ber ku feraseta Hişmendîya Dîndar ya li ser heq û edeletê jî kufikî ye, ne mimkin e ku ew bibe xwedî nirxên exlaqî jî.

Ya ku dihêle Hişmendîya Dîndar bi realîteya xwe ve hevrû bibe û cesaret bike bifikire, bi radeya wî ya perwerdeyê jî tuneye.

Hişmendîyeke ku bawerîya xwe bi gotina "Ji hîkmeta Xudê sual nabe" bîne, radeya perwerdeya wî çi dibe bila bibe, ne pêkan e ku bibe xwedî melekeya hizirkirineke analitik. Her çiqas radeya perwerdeya wî bilind be jî, berhema zanîna wî xwe dispêre encama aqilekî ezber.

Loma, dema di têkilîyên nava însanan de bi problemên herî piçûk re rûbirû dimîne, her çiqas xwedî perwerdeyeke bilind be jî, ji ber ku ji hizirkirin û hevrûbûna bi rastî û realiteya xwe ditirse, bi helwesta xwe mecbûr dimîne veguhere cuceyekî!

Ji ber ku zorkirin û îhlalkirina sinorên ku ji hêla bawerîyê ve hatine diyarkirin, ji Hişmendîya Dîndar re dibin sedema travmayê, manîdar e ku ew ji hizirkirineke azad û analitîk bireve.

Dema ji vê perspektîfê li helwesta koma Yahûdîyên ku piştî li nêynikê nêrîbûn û ji cîhê bûyerê reviyabûn bê nêrîn, divê bê qebûlkirin ku koma Yahûdîyan li gor xwezaya Hişmendîya Dîndar tevgeriyane.

Ku bê komkirin:

Di vê nivîsê de, têgeha Hişmendîya Dîndar ne bi maneya qestkirina dîndarên oI yan jî bawerîyekî hat bikaranîn. Hişmendîya Dîndar, divê wek şikleke nirxandin, famkirin û çalakîyeke bi serê xwe û taybet bê ditin.

Berî hertiştî divê bê gotin ku Hişmendîya Dîndar hişmendîyeke hîyerarşîk e ku îtaetê li nirxên bawerîya xwe dike. Melekeya pirskirina nirxên ku wek pîroz tên qebûlkirin pê re tuneye. Wekî di mînaka Hz. Îsa de jî derkete holê, gava mecbûr ma li nêynikê binêre û bi realiteya xwe re hevrû bibe, ji bilî ku ji realiteya xwe bireve, ti alternatîfeke wî tuneye.

Divê li hêla din, îdeolojîyên wek sosyalîzm, komunîzm û faşîzm jî wek bawerî bên dîtin.

Bawermendên van îdeolojîyan jî dîndarên van îdeolojîyan pêk tînin.

Çing ku ol însanên derveyî xwe wek gawir û kafîr dibînin, îdeolojîyên ku navê wan hat hildan jî, kesên ku ne bi wan re û bawerîya xwe bi prensîbên wan neynin, wek xaîn û ajan dibînin. Niqteya hevbeş ya van bawerî û îdeolojîyan ev e, nirxên xwe ji mirovê takekes bilindtir digirin.

Vê rastîyê meri dikane ji biwêja ku dîndar pê qaşo humanizma xwe tînin ziman ji bîne der: "Em ji yê ku hatiye afirandin, ji ber aferiner hez dikin!" Di vê biwêjê de yê ku esas tê hezkirin, ne yê ku hatiye afirandin, yanî însan e. Yê ku esas tê hezkirin aferiner, yanî Xudê ye. Yanî siftê Xudê û paşê însan e.

Loma kîjan bawerî û îdeolojî dibin bila bibin, heta ku heysiyet û şerefa mirov wek takekes pîroz qebûl nekin û rêzê li ber negirin, ne pêkan e ku dîndar û bawermendên wan bawerî û îdeolojîyan rêzê li ber heysiyeta mirovan bigirin û qimetê bidin wan.

Di vê niqteyê de, wekî ku Psikiyatrist Dr. Agah Aydın jî anîbû ziman, divê careke din bê gotin: „Ji roja jidayikbûnê heta roja mirinê, her daxwaza mirov ji bo hezkirin û rêzgirtinê ye."

Ji bo ku mirov li ser vî esasî bikaribe qimet, rûmet û rêzgirtineke layiqî heysiyeta mirovan nîşan bide, divê xwedî cesaret be, derbasî pêşîya nêynikê bibe, bi nasname û kesayetîya xwe re hevrû bibe.

Kesê ku cesareta wî ya hevrûbûna bi nasname û kesayetîya xwe nebe, dikare bibe kurd, tirk, misilman, yahûdî, komunîst, faşîst, akademîsyên û profesor, lê belê, bi hîç û hîç, bi ti awayî û ti demê ne pêkan e ku bibe însanekî xwedî îrfan û exlaq.



Doşo

Şefîq Pêşeng

Salên me lê dixwend Diyarbekir li gorî bajarên din ên bakurê welatê me, bajarekî mezin û mîna hemû bajarên mezin ji alîyê ehlê xwe ne bajarekî safî û xwerû bû. Ku ez dibêjim mezin, nifûsa wê dora 150 hezarî bû. Niha gelekî mezintir lê ewqas jî bêtir tevîhev bûye. Ji Licê, Çêwlik û Bedlîsê, ji navçe û gundan gelek kes hatibûn li bajêr bi cîh bûbûn. Di destpêka salên 1970yî de êdî nifûsa çewlikî, bedlîsî û lîcîyîyan ji ya diyarbekirîyên xwe eşraf û xwedîyê bajêr didîditin, derbas kiribû.

Li Diyarbekirê rojnamefiroşekî bi nav û deng hebû. Navê wî rojnamevefiroşî Doşo bû. Malbata Doşo di Şerê II.yê dinyayê de ku eskerên rûs gihaştine Bedlîsê, cîh û warê xwe terikandiye û hatiye li Diyarbekirê bi cîh bûye. Ew êdî weke bi sedan malbatên din him bedlîsî him diyarbekirî ne. Lê Doşo di 1926an de li Diyarbekirê, li taxa Elî Paşayê li jiyanê çavên xwe vedike û diyarbekirîyekî xas e, Gedê Bajêr e.

Weke ku hûn ê texmîn bikin, navê wî yê rast ne Doşo ye,

lê herkes wî bi vî navî nas dike. Şeyhmus Diken yek ji nivîskar û rojnamevanê naskirî yê Diyarbekirê ye. Dîken diyarbekirnas e, evîndarê kevirên reş, kûçeyên teng, dêr û mizgeftên bajarê xwe ye. Bi gotineke sade, Diken diyarbekirperwerek e. Di nivîs û kitêbên xwe de vî bajarê kevnar û di dîroka me de weke çiyayekî xweragir, weke dayikekê himbêzvekirî û xweşbîn, bi zarxweşîyekê mezin dide nasîn.

Diken bi nivîsekê Doşoyê ku ji bîra me gelakan çûbû, bi bîra me anî[1]. Doşo biçûkê xwişk û birayên xwe, zarokê dehan yê dê û bavê xwe bûye. Hemû xwişk û birayên wî, hêj ew çênebûye mirine. Di demeke dê û bavê wî bêhêvî dibin, Xwedê Doşo dide wan. Lê dê û bavê wî tirsiyane ku ew jî bimre. Ji bo Xwedê wî ji wan re bihêle, çûne ber derîyê şêx û meşayixan û herweha ber derîyê keşe, keşîş û dêran jî. Navê Doşo yê rast Yakûb e. Piştî çend şêx û meşayîxan, wî dibin cem pîrejineke ermenî. Pîrejin li dêra ku ew jî cîranê wê ne dimîne. Pîrejin li Yakub dinêre û dibêje; ‘’ Miraq mekin, her terefê vî zarokî goşto ye, doşo ye, tişteк pê nayê!’’ Piştî vê serdanê, êdî navê wî Doşo ye û Yakup tê jibîrkirin. Xwedê ji bo xatirê şêx û meşayîxan û pîrejina ber derîyê dêrê, wî ji dê û bavê wî re dihêle.

Dema min Doşo nas kir, Doşo rojnamevefiroşekî xwedî kulûbe bû. Lê helbet Doşo di rojekê de nebûye rojanamefiroş. Berîya vî karî jî heye. Wî bi heval û hogirên xwe re li kuçeyên Elî Paşayê lîstiye. Kuçeyên Elî Paşayê kevir bi kevir, gav bi gav, fitlonek bi fitlonek nas kiriye. Ew di zaroktîya xwe de pêşîyê li ber destê terzîyekî xebitiye. Bi derzîyê vekirina ta, karê wî bûye. Paqijîya dikana heşt gav fireh, deh gav dirêj û herdem du kursî li ber derîyê wê, şuxlê wî bûye. Di dema probeyan de firçekirin û jêbirina ta û pirtikên li ser qatlixan, avreşandina ber derîyê dikanê jî, ji bo mişterîyan çayxwestin, ji şuxlê wî bûne.

Doşo di ciwanîya xwe de, demekê jî çend biskilêt kirîne û ew dane bi kirê. Mişterîyên wî zarok bûne û cir û qayîşa bi zarokan re ew westandiye. Axirê dest bi firotina rojnameyan kiriye. Do-

1 https://www.tigrishaber.com/ben-bir-doso-idim-kendi-halimda-2561yy.htm

şo di navbera Derîyê Çiyê û heta Mêrgehmed û Derîyê Mêrdînê, rojname li ser nigan firotiye. Piranîya mişterîyên wî dikandar û mişterîyên çayxaneyên taxê bûne. Wilo mişterîyên xwe nas kiriye ku dizane kîjan mişterî kîjan rojnameyê û nivîsên kîjan nivîskarî dixwîne.

Ku salên wî mezin dibin, dibîne ku wilo nabe. Ji xwe re li kulûbeyekê digere. Di wê navê de Şair Sezayî Yilmaz dil dike ku kulûbeya xwe dewrî yekî minasib û hezkirîyê rojnameyan bike. Bi Doşo re li hev tê û kulûbeyê dikire. Kulûbeya wî li Derîyê Çiyê, li Meydana ku paşê navê wê bû Meydana Şêx Seîd, bû. Di wan salan de, devera kulûbeya wî lê, navenda bajêr bû. Devereke bi liv û hereket, bi bereket û jîndar bû. Rawestgeha herî mezin ya dolmîş û faytonan li wir bûn. Sînemayên bajêr Ari, Yenişehir, Dîlan û Sîte, nexeşxaneya bajêr, Fakulta Tibê, Xwendingeha Mamosteyan nêzî meydanê bûn. Sûka herî bi hereket ya bajêr ji meydanê dest pê dikir û heta Derîyê Mêrdînê diçû.

Di dawîya salên 1960î û destpêka salên 1970î de qirix, tolaz, pêxwas, qebrax û pêzevangên Diyarbekirê jî li wê meydanê ne û mişterîyên Doşo bûne. Doşo li wê kulûbeya sê gav fireh û çar gav dirêj, rojname, kovar, cixare, çeqmaq, kibrît û tiştonek û miştonek firotine.

Şuxlê pêxwas, qirix û tolazan û yê qebrax û pêzevengan ji hev cuda bûye. Qirix û tolaz çavlider bûne, li serê vê û wê kuçeyê li benda jineke jirêderketî, pêxwas jî li benda gundîyekî saf bûne. Lê Qebrax û pêzevengên porê wan û pêlavên wan ji heman rengî, sîmsarîya kerxaneya bajêr kirine. Berê ciwan û nûciwanan dane kerxaneya bajêr. Xortên nûgihaştî û yên ji derûdora bajêr rêya kerxanê nizanibûne. Rêpirsîna kerxanê jî şerm bûye. Evan qebrax û pêzevengên bi salan li wê meydanê bûne çavnas û serafên însanan, bi derbekê derxistine kî li rêya kerxanê digere, ew an li faytonekê siwar kirine an rê nîşanî wan dane û ew şandine wir.

Lê ji bo derbasbûna nûciwanên emrê wan di binê 18an de li ber derîyê kerxanê astengî derdikeve û polîs wan derbasî kerxanê nake. Qebrax û pêzevengan ji vê yekê re û li gorî isûla xwe çareyek dîtine. Wan bi bihayê pênc lîreyan

fîşek daye xortên temenê wan di binê 18an de, wan jî ew fîş daye polîsên ber derîyê kerxanê û wilo derbasî hundir bûne. Polîsan jî mehê carekê li gor hejmara fîşên di destê wan de, perê xwe ji qebrax û pêzevengan stendine.

Rojekê çend ciwanên bi vê meselê hesiyane, rasterast diçin ba van sîmsaran. Her yek pênc lîrayê xwe dide, fîşa xwe distîne. Ciwanên emrê wan ji bo derbasbûna nav kerxanê têr nake, tevî fîşên destên xwe berê xwe didin kerxanê. Hewa xweş e, roja şemîyê ye û li ser rêya kerxanê qefle bi qefle xort û mêr ber bi kerxanê ve dimeşin. Li ber derîyê kerxanê ecqe çêbûye. Ên naxwazên di dorê de bimînin, nasekî qedirbilind peyda dikin. Hinên dinê di nav xwe de pere berhev dikin û didin polîsan. Piştî qederekê dor tê komika şagirdan, fîşên xwe didin, lê polîs bi hinceta ku gelek qelebalix e, wan derbas nake. Polîs dibêje mezinê wan; ‘’Felan rojê werin, ez ê we derbas bikim!’’

Ew jî neçar dizîvirin. Roja ji wan re hatiye gotin, cilên xwe yên xweşik li xwe dikin, porê xwe şeh û şayîk dikin û didin dû hev, diçin. Îd e û ber derî ji cara dinê jî qelebalixtir e. Ciwan, navser û porspîyên li pê macerayekê di dorê de ne. Mezinê komikê diçe ba polîs û meselê jê re dibêje. Polîs jî bi lez wan derbasî hundir dike. Hêj yê dawî derbas nebûye, ji nav qelebalixa di dorê de dengê nerazîbûnê bilind dibe. Dengek ji vir, yek ji wê. Polîs dibîne ku nerazîbûn zêde dibe. Dibêje; ‘’Birêzno! Ev zarok ne mişterî ne, ev zarokên van qehpikên hundir in, diçin îda dayikên xwe!’’ Qelebalix jî wilo dengê xwe dibire.

Piştî nîveka salên 1970yî ku tevgera şoreşger û welatperwer li Diyarbekirê bi hêz bûbû. Piranîya mişterîyên Doşo jî êdî şoreşger in. Doşo zû fêrî islûba mişterîyên xwe yên nû bûbû. Di nav xelkê de ji mişterîyên wî yên nû re Telebe dihate gotin. Mişterîyên wî yên nû ciwan bûn, xwîngerm û liv û tevgera wan bi lez bû. Kulûbeya Doşo li pêş komeleya me bû. Em rojane di ber kulûbeya wî re derbas dibûn, me rojana çar-pênc rojname jê dikirîn. Tevî sûretekî Bulent Ecevît raserî wî daleqandî bû, me silav dida hev, li ser nigan li hal û xatirê hev dipirsî. Erê ji Ecevît hez dikir, lê ewqas jî ji telebeyan hez dikir. Xwe ji wan, ew ji

xwe didîtin. A min û ya wî tenê silav bû. Lê têkilîya wî û ya hin hevalên me ji silavê zêdetir bûye. Wilo ku hevalekî me kovarên me dide wî û dibijê; Bidizî bifroşe! Ew jî qebûl dike. Di nav xwe de paraloyekê tesbît dikin. Parola weha bûye; ''Ka Hurriyetekê û Hurriyeteke dinê!'' Dema mişterîyek hatiye û ev parola gotiye, Doşo jî pêşîyê rahiştiye Hurriyetekê, paşê ji bin dezgehê kovarek derxistiye, xistiye nav Hurriyetê û dayê mişterîyê xwe.

Ev danûstendin, heta darbeya 12ê Îlona 1980î wisa dom kirîye. Bi darbeya 12ê Îlonê, mişterîyên Doşo dîsa diguherin. Telebe ji nişka ve wenda dibin. Weke erd qelişîbe û tev ketibin bin erdê, kes ji wan xuya nake. Ev rewş Doşo xemgîn dike, lê tiştek ji destê wî naye.

Di destpêka salên 1990î de, dewran dewrana Hizbullahê ye. Profîla mişterîyên Doşo dîsa diguhere. Doşo rojname û kovarên ku weke kovar û ronameyên mixalif tên nasîn û zû bi zû kes wan nafiroşe, difroşe. Tirseke mezin, ewrekî reştarî bi ser bajêr girtiye. Rojane çend kesên mihtemelen ji mişterîyên Doşo yên salên 70î, li serê vê an wê kuçê li ber çavan têne kuştin. Terora Hizbullah û polîsan wisa kirîye ku dikan û sûk êdî zû têne girtin. Xelk bi lez diçe mala xwe û her dever ji nişka ve vala û xalî dibe. Doşo jî dibe armanca vê terorê. Di navrojekê de bi qama û satûran êrîşî Doşo dikin. Wî li erdê digevizînin. Di nava xwînê de dimîne. Saetekê li erdê dimîne. Kes newêre here ser. Lê ji vê êrîşî birîndar xilas dibe.

Doşo di 2005an de ji nişka ve bêdeng ji vê dinyayê koç dike. Kes mirina wî ferq nake. Dema tê veşartin, malbat û çend merivên wî li gel wî ne. Kes xweşkayî bi mirina wî jî nahise.

Bila cîhê te bi dilê te be!

ÇIMA MUZE ?

Prof. Dr. Haci Akman

Muzexane bîr û nasnameya civakê ye

Belgekirinên mirasa kultura kurdan bi giranî li Skandînavya û Ewropayê hatine berhevkirin. Projeya belgekirina Mîrasa Kultûrî ya Kurdî ya Norwêcê di 2004an de dest pê kir, û di sala 2006/2007an de ji bo qonaxa diduyan fînanse wergirt.

Materyalên ku hatine berhevkirin ji huner, fîlmên etnografîk, wêne û materyalên dengî-dîmenî yên ku maddîkirina alîyên ne maddî yên mîrasa çanda kurdî vedibêjin pêk tên. Di xebata belgekirinê de, bi giranî li ser hevpeyivînên bêpergal, rêbazek kalîteyî hatiye bikaranîn. Di tedawîya çavkanîyê de, prensîbek bûye ku agahdarker li gorî taybetmendî û paşxaneya xwe were dermankirin. Ji ber vê yekê pirsên ku têne pirsîn bi qasî ku gengaz dibe li gorî texmîn û

*Şerefname*ye ku di sedsala 16an de (1597) ji alîyê nivîskarê kurd **Şerefeddîn Han El-Bitlîsî** (1543-1599) hatîye nivisîn.

bingehên agahdarker têne adaptekirin. Sedema ku nêzîkatîyek wusa metodolojîk hate hilbijartin bi vê yekê ve girêdayî ye ku bi giranî du kom hene ku dê lêkolîn bikin. Yek sazîyên çandî yên baş-damezrandî di forma arşîv, pirtûkxane û muzeyê de. Ya din di forma berhevok û arşîvên kesayetîyên çandî yên taybet de. Lêbelê, dijwarîya hilbijartina rêgezek weha ew bû ku meriv bersivên agahdarkeran bide ber hev. Awayê çareserkirina vê yekê ew bûye ku hin taybetmendîyên hevpar ên ku mijarên cihêreng di nav xwe de vedihewîne, wek; zanîna mîrata çandî û dîroka kurdî, avahî û rêxistina arşîvê, parastin û belavkirina tiştan û pisporîya pîşeyî û paşxaneya berhevker.

Metodolojîyek girîng ew bû ku çawa tiştên kurdî hatine parastin, belavkirin û belgekirin. Di herdu qonaxên projeyê de I û II, me dît ku di derbarê mîrasa çandî ya kurdî de kêm zanîn hene. Vê yekê encamên çawanîya organîzekirin û ragihandina tiştan ji gel re heye, di heman demê de di pêvajoya belgekirinê de gihîştina tiştan jî pirsgirêk dike. Pirsgirêkek din a di derbarê rêbazê de ev e ku tişt çawa bi fîzîkî têne hilanîn. Di vir de cûdahîyên mezin hene ku sazîyên çandî yên taybet û baş-damezrandî çawa tiştan hildigirin.

Di xebata bi muzexaneya ya kurdî ya Norwêcê re, ji ber vê yekê girîng e ku muzexaneyek ku

nûnertîya kurdên hemû parçeyên Kurdistanê bike, were damezrandin. Ya duyemîn, girîng e ku meriv li tevliheviya diyasporayê bi rengekî giştîtir binêre. Bandora berdewam a koçberîya bi darê zorê, entegrasyon, asîmîlekirin û veqetandinê çanda kurdî pir bêhêz dike. Lêkolîna min a li ser nasnameya kurdî nîşan da ku kurd xwedî hişmendîyeke xurt in ji kurdbûna xwe, lê ji naveroka nasnameya xwe ya kurdî ne bawer in. Di hin rewşan de dibe sedem ku ji efsane û bawerîyên civaka mazûvan efsaneyan ava bikin û bikin ya xwe. Reaksîyonek jî ew e ku mirov xwedîyê nasnameyeke giştî ya ku bi xwe nivîsandî ye, û nasnameya kurdî ya ku tê de tê kirin heye.

Muzexaneya Kurdî ya Norwêcê dixwaze mîrasa kulturî ya kurdî li dîasporayê hêsan bike û belav bike. Di heman demê de ku muze dê danasîna hevdîtinên çandî yên di navbera norwêcî û kurdan de bi perspektîfa berê û ya îroyîn pêşkêş bike, dê di heman demê de danasîna dîasporaya kurdan li welatên din jî pêşkêş bike. Ev qonaxek dikare li ser civakên kurd ên dîasporayê bi giştîbûna wan veke.

Kêmbûna zanyarîyan di derbarê berhemên kurdî de rê li ber sîstematîzekirin û katalogkirina wan di kategorîya rast de li muzexaneyan teng dike, lê ev yek jî bandorê li belavkirina berheman dike. Ji alîyekî din ve, ev tê wateya hinekî xebata detektîf û naskirina tiştên kesane. Ji bo vê jî jêhatîbûn û zanîneke taybet a dîrok û pêşketina kurdî dixwaze. Ji ber ku kurd bûne bindestê çar dewletan jî zehmet e ku mirov ji hev cuda bike ka bi rastî çi kurd e û çi wekî kurdî nayê pênasekirin.

Taybetmendîya muzexaneyên cihê yên ku me pê re têkilî daniye ew e ku tişt li gorî girêdana herêmî

û neteweyî an jî bi parzemînek an olek (îslam, xirîstiyanî) ve hatine kategorîzekirin. Ji bo ronîkirina vê yekê bi mînakekê, Muzexaneya Brîtanyayê nasnameyên diyasporayê yên bêdewlet ku di bin referans û girêdanên erdnîgarî yên din de hatine katalogkirin. Nesneyên kurdî wek eşyayên îranî, iraqî, tirkî û sûrî, an jî bi giştî tiştên ji Mezopotamyayê hatine binavkirin. Ger hûn serlêdana termê bikin; Kurdistan li ser COMPASS, koleksiyonên dîjîtal ên Muzexaneya Brîtanîyayê, em dikarin tenê tiştek bibînin, ango Tawusekî Melek. Nivîs ji me re dibêje ku tawus ji Îranê tê, û dikare bi salên 1900î yên PZ. Wekî din, ji nivîsa tawus derdikeve

Tawusê ji pola, Muzexaneya Brîtanya

holê ku di cîhana îslamê de sembola bedewî û kêfê ye û ji ber vê yekê di beşa berhemên îslamî de wekî îranî tête navnîşkirin.

Pirsgirêkeke din a girêdayî xebatên belgekirinê, bidestxistina agahîyên li ser arşîv û koleksiyonên taybet e. Di heyama 1980î de heta îro, hejmarek ji rewşenbîrên kurd yên rewşenbîrî li welatên cuda yên Ewropayê xwe bi cih kirine. Ev kesên hanê ji ber xebata xwe ya zanistî û dîrokî ji bo eşkerekirina eslê kurdan bi darê zorê hatine sirgûnkirin û herî dawî jî bûne şampiyonên

zimanê kurdî. Agahdarên kurd dîasporayê wek destkeftîyek dibînin, ji ber ku ev yek ji wan re derfeta îfadekirina nasnameya xwe, bêyî ku ji hebûna xwe bitirsin. Mahmut Lewendî, Rohat Alakom, Mehmed Emîn Borzarlan, Ali Cifci (APEC– Förlag), û Sara Distribution çend mînakên ji van kesan in ku xebatên xwe hem berhevokên mezin û hem jî piçûktir ên maddî yên wekî destnivîsên kurdî yên kevn, belgeyên wênekêşî, weşan û kovarên mîzahî pêş xistin. Lê li hemberî zordestîya siyasî, civakî û çandî, di warê radestkirina zanyarîyên li ser malzemeyên ku di destê wan de ne, xisarîyek heye. Hêjayî bibîrxistinê ye ku xebat û naskirina çanda kurdî sedema bingehîn e ku niha li sirgûnê dijîn. Ji ber vê yekê piranîya xebata li ser belgekirina mîrateya çandî ya kurdî ji bo bidestxistina bawerîyekê ye ku dê materyal bi rengekî guncaw û bi hevkarîya wan were hilanîn. Lêbelê, Ulrika Wolf-Knuts û Lena Marander -Eklund jî bikaranîna anekdotên kesane ve behsa nêrînên exlaqî dikin. Di dema berhevkirin, arşîvkirin, sererastkirin û weşandina bîranînên kesane de, li cihê ku anekdotên kesane bi tundî lê hene, pirsgirêk dikarin derkevin holê. Di berdewamîya projeyê de, girîng e ku rêgezên exlaqî yên têkildarî belgekirina çîrokên kesane yên ku dibe ku çîrokên li ser mirovên din ên di nav ci-

vaka kurd de hebin, were danîn. Di heman demê de gelek pirsgirêk bi hilanîn û parastina tiştan ve girêdayî ne. Mînaka vê berhema dîrokî *Şerefname* ye ku di sedsala 16an de (1597) ji alîyê nivîskarê kurd **Şerefeddîn Han El-Bitlîsî** (1543-1599) ve hatiye nivîsandin û berhema lêkolîneke demdirêj e. Lê haya me tune ku *Şerefname* çawa anîne Îngilîstanê.

Destnivîsa orîjînal li Pirtûkxaneya Bodleian a Zanîngeha Oxfordê dihat parastin û çavkanî dibêjin ku ev kar paşê ji Muzexaneya Brîtanyayê re hatiye veguhestin. Paşê destnivîs ji bo Pirtûkxaneya Brîtanî hat veguhestin. Digel ku çavkanî vê yekê piştrast dike, muhafezekar red dike ku destnivîsek orîjînal hebe. Piştî gelek danûstandinên paş û paş, ev bersiva ku wî da me;

”It is doubtful whether the original manuscript of Sharaf Khan’s Sharafnamah exists anywhere. The Library has four copies, none of which date from any time close to the author’s lifetime, which is undated but probably early 19th century.”

(Dr. Muhammed Isa Waley, berpirsîyarê berhevokên farisî û tirkî.)

Kurdish Womans Life. 1961
Henny Harald Hansen
(National museum- bildesamlinger- Kopenhagen)

Di axaftinên paşerojê de, ew red dike ku kar bi kurdan re hebe. Ew dibêje ku ev berhem bi farisî hatiye nivîsandin, û çîroka

gelên Rojhilata Navîn vedibêje, ne ya kurdan taybetî ye. Ev mînak nîşan dide ku têkilîyeke xurt di navbera mîrateya çandî û siyasetê de heye û dewlet di nav sînorên erdnîgarîya dewletê de mafê milkiyeta meşrû ya çandê digirin. (Krabbe, 2005:88)

Dokumentasyon

Xebata ji bo bidestxistina zanyarîyan û nerîneke giştî li ser hebûna malzemeyên mîrasa çandî ya kurdî li dîasporayê.

Hilberîna encamek ku bikaribe ji bo lêkolînên pêşerojê li ser alîyên cihêreng ên mîrata çandî ya kurdî bibe çavkanîya çavkanîyê.

Diaspora di eslê xwe de,

têgîna diyaspora ji têgînên latînî dia (li seranserî) û sperien (belav kirin) tê. Wate bi gelemperî bi gel û komên etnîkî ve girêdayî ye ku - bi dilxwazî an bê dilxwazî ji welatê xwe yê resen koç kirine. (Brazîl û Mannur, 2003)

Diaspora kurdi girêdana xurt bi nasnameya welat/nasnameya cihanê re.

Referansên dîrokî û têkilîyên xizmtîyê yên biyolojîkî, û eslê wan ji bav û kalên wan Medîyan re. Bi paşnavê zimanê kurdî yê cuda kurmancî û soranî.

Armanca danîna Muzexane-ya kurdi dê wekî qada civakîbûn û hişyarkirina mîrata çandî ya kurdî li ser asta cîhanî kar bike.

Armanca ewlekirina daneyên

ku ji hêla makîneyê ve têne xwendin, û her weha zanîna hebûna materyalê ye.

Hêza kontrolkirina dem û cîhê virtual li diyasporayê peyda dike. Pêşniyara virtual bi tixûbên neteweyî an dewletan ve girêdayî tune.

Pergalkirin û katalogkirina tiştan dê nêrînek çêtir peyda bike û fersendê pêşdebirina zanînê li ser warên cihêreng peyda bike. Di navbera sazîyên çandî yên ku li malzemeyên mîrata çanda kurdî dinerin de hevkarîyê pêş bixin. (Nimûne; Muzeya Horniman, Çemên Pitt).

- Amûrek perwerdehîyê pêşve bibin.
- Çêkirina databasa tiştên kurdî û çi dikare were kirin?
- Organize ava bikin.
- Kêmbûna zanyarîya paşerojê li ser tiştan.
- Tiştên wekî kurdî nayên pênasekirin û meşrûkirin
- Berjewendîyên siyasî - çand?
- Fonksiyona lêgerînê çêbikin.
- Nivîsê wergerîne kurdî û îngilîzî.
- Pisporîya pîşeyî bi qadên cûrbecûr yên pîşeyî ve girêdin da ku kalîteya agahdarîyê bi cîh bikin.

Encama dabeşbûnê

Dabeşbûna erdnîgarî: Yekitîya etnîkî ya kurdan xera kiriye.

Dabeşkirina dîrokî: Çar parçeyên Kurdistanê hem xwedî referansên dîrokî yên hevpar û

Mehdî Zana li muzexaneya kurdî ya li Norwêcê

hem jî cuda ne. Dema ku referansên dîrokî ji holê rabin, karê damezrandina mîrata çandî ya kurdî dijwar dibe

Çand: Hilberîna çandî bi awayên curbecur pêş ketiye. Bandor li hevjiyana kurdan kir.

Mîrasa çanda kurdî bi awayên curbecur hatiye xerakirin. Têgîna aîdiyetê alîyekî ye. Têkilî bi tiştekî nerast ve girêdayî ye, divê rast were pênasekirin. Înkara di siyasetê de nasnameya referansa dîrokî aloz dike. Jicîhûwarkirin û bicihbûn alîyekî din e. Mînakek polîtîkayên asîmîlasyonê ye ku parastin û nexşekirina mîrateya çandî dijwar dike. Divê kurd weke gel vê parçebûnê "temîr bikin" û weke yek gel bibin yek. Girîng bû ku muzexaneyek ku nûnertîya kurdên herçar parçeyên Kurdistanê bike; Îran, Iraq, Sûriye û Tirkiye. Ya duyemîn, girîng e ku meriv li tevliheviya diyasporayê bi rengekî giştîtir binêre. Bandora berdewam a koçberîya bi darê zorê, entegrasyon, asîmîlekirin û veqetandinê çanda kurdî pir bêhêz dike. Lêkolîna min a li ser nasnameya kurdî nîşan da ku kurd xwedî hişmendîyeke xurt in ji kurdbûna xwe, lewma di diyarkirina naveroka nasnameya xwe de zehmetîyan dikişînin.

Di hin rewşan de dibe sedem ku ji efsane û bawerîyên civaka

mazûvan efsaneyan ava bikin û bikin ya xwe. Reaksîyonek jî ew e ku mirov xwedîyê nasnameyeke giştî ya xwe-nivîsandî ye û nasnameya kurdî ya ku di çarçoveyeke kurdî de tê bikaranîn heye. Dabeşbûn û kaosa di nasnameya kurd de bi jiyana li dîasporayê ve girêdayî ye û têgihiştinên li welat hatine avakirin. Antropolog Martin Van Bruinessen da xuyakirin ku dîasporaya kurd di pêşxistina hişmendîya çandî de roleke diyarker lîstiye. Koçberên kurd ên ku li Ewrûpayê mezin bûne, dixuye ku haya wan ji nasnameya xwe ya nû heye. Muzexaneyên kurdi li ser gelek alîyên çanda kurdî hatine amadekirin, ji çanda xwarinê, kevneşopîyên hunerî, dîlan, cejna Newrozê û hwd. Ji bo dîtina hilberandin û vejandina çanda kurdî.

Bo nimûne:

Di bihara 2003an de bi navê *Welatê ku roj jê hildê* li taxeka Stockholmê ya bi navê Fitjayê pêşengeheke profesyonel bi hevkarîya kovara Bîrnebûnê û Mångkultutellt Centrumê hat lidarxistin. Pêşengeh ji alîyê şabanûya Swêdê, xatun Silviya de hatibû vekirin. (*Bîrnebûn hejmara 20-2003*)

Di sala 2006an de li Xelkê Qerecdaxê muzaxaneyek vekirin, berhemên destî tê de hatine parastin. (*Bîrnebûn hejmara 32-2006*)

Ji Muzexaneya Kurdî ya Norwêcê

AXÎNA BAJARÊN RENGÎN

Xizan Şîlan

dayê, rebenê
diwarên avahiyan bi ser min de
hilneweşiyan
tofana muhendis û mutehidên diz
sekbav, bêwijdan
bêdilovan, bextreş
harbûyî, çavbirçi û heramzade
bi ser laş û giyanê min yê sefîl de
hilweşiya
ez
naleta serdeman li kujeran
dibarînim
kesek qêrîn,êş
nalîn û hawara min
nabihîze
di bin kavilên wêran de
can dikişînim
ji tîna qewirîm
ji ber birçîbûn û sermayê
dicirifim
henas li min
diçikê
gelo ev qedera min e
pênûsa helbestvanan
xwîn vedirişe
kelime û gotin li ser ziman
qurifîn
rûpelên defteran
qurmiçîn
nasnameya min di ferhengan de
cîh negirt
heyvê reş girêda

ji çavên reşewran rondikên sar
diniqutîn
asîman lerizî, roj tevizî
movikên pişta demsalan
şikest
gund û bajar bûn toz û qûma
çolistanan
teyr û tilûran berê xwe dan
warên nediyar
kulîlkên bax û bostanan
nepişkivîn
xewa şevên şîrîn
li dayika min ya kezebşewitî
herimî
ez bûm qurbanê sextekar
û fêlbazan
çima cîhan ker û lal e
ka mirovahî li ku ma ye
kefenekî reş
li cendekê min
yê bêguneh û bêçare
hate pêçandin
darbestan şerm kirin
dêleguran
ez bi saxî xistim
tirba bêxwedî, bênavnîşan
û bi axa sor hatim
nixumandin
eyyyy hawar hawar
ev çi karesateke
bêreng e
ev çi mirineke jankêş
û bêdeng e

2023-02-09, Stockholm

QERFO

Seyfi Doğan

xizanî yê
bi gotinên nayên ispat kirin
dixemilînin

xanîyê bilind
ji ax û avê
û cîranan dûr

çavekî li televîzyon
yên din li telefon
lêwik *ipad* di dest da

roj kete paş ewran
dostê min
ji nişkeve winda bû

ya li pêş
ya li paş
li kelekê hevdu rehma xwedê

rojê nebînê
çavên xwe digre
di ser agir re bezdide

kîlîdê
qestrên tarî
ji zêr in

xewnên şirin
zimanê xweş
hewa sar

QOTO

Seyfi Doğan

demê xwe hat
darê sêva
a gulan veke

hekata
evînê
di guh da piskand

agir
gemarî nebe
û gemarî neke

aştî
dilşadîya
jinan e

demsalê payîzê
xwaza yê
dest fere ye

roj çû ava
dilê minî zîz e
ruhê minî li rêwîtîyê

çavên te agirên vaşartîyên ku
di sîngê min da
dilerizine

xwedê dengêkî xweş dayê kurda
ku neheqîyê hatine serî wana
bi dengbêjîyê hewara xwe bibêjin

Jin û etîmolojîya du navên qedîm: Bodê û Bostan

Bilal Celepli

Jin li ba me her dem bi qîmet bûn: li ber her karî jin hebûn û fikirê wan girîng bûn.

Jin li ba kurdên Anatolîya Navîn rêhevalê mêran bûn. Qîmeta jinan ji dema koçberîyê da heta cihbûnê tim hebû.

Jinan va qîmet û girîngbûna bi xwe qezenç kirin û dest xwe xistin. Ewna pir caran ji mêran pirtir şuxilîn û xebat kirin û li pêş ketin. Li nav kurdên Anatolîya Navîn ji bo tiştên wek kar û bereketê her dem mêr li pêş xuya dikirin, feqet jin çiqas li paş xuya bikin jî karê mezin li ser pîyê wan bû û jin bargiran bûn.

Ekonomîstê navdar yê Skotlandê Adam Smith metaforeka xwe ya taybet û bi qîmet heye: destê xuya nake, bi navê orîjîn ‘ the invisible hand ‘.

Adam Smith bi vê metaforê diwê her tiştek û her karek bi xwe di rê keve, hûn rehet bin û qaxî mekşînin. Hûn karê li we ketî ji dil û bi xwastineka mezin bikin desteka xuya nake û pîroz, e were û karên we di rê kevin. Li jiyana me jî ew destê pîroz hertim jin bû.

Jinên Anatolîya Navîn jî barê mêra sivik dikin, karên me vê qaxî dikin rê, ew mînaka Adem Smith gotî ‘*the invisible hand* - destê xay nake ye.‘ Yanî jin li nav Anatolîya Navîn desteka xuya nake û pîroz e.

Jin pir caran tuneyîyê dikin heyî û dibin doxtor, hûnermend, dengbêj.

Mêran pez çêrand, jinan ew dotin û ji şîr rûn, mast û penêr çêkirin.

Jinan ji gil û gîya, ji daran boyaxa kokan çêkirin û bi tevinê xali, merşik û cil çêkirin.

Jinan ji postê berxan bêjing çêkirin, bi wê bêjingê ard lêkirin û bi wî ardî nan lêxistin.

Jin, carna jî dibûn doxtor û hekîm: bi hevîr, bi goşt, yan jî bi zeytûnan pê û ningên şikestî derman dikirin.

Jin bi kilamên xwe jî bûne dengbêj û dîrokzan: ji me ra qalê Hecî Buhurcu, Mistoyê Tozo, Xalê Deli Pepe û qalê evînên berê dikirin û şevên dirêj bi çîrokên wan derbaz dibûn.

Mêrên me jî bi rastî qîmeta ku jin heq dikin, didayîn wan û roj dihat bi şoreka jinan, bi kitaneka jinan şer xelas dikirin. Ez dixwazim ji bo wê qalê hekatekî bikim:

Çimana Biçûk zozanê Gundê Kehya (Beşqawaqê Mezin) ye. Navê xwe fermî Yeşildere ye.

Ji eşîra Têrikan xwanga Duman Beg, navê xwe Elok, bi Hecî Mahmadê Qerefekîyan va direve û dizawice. Malbata Qerefekî jî ji eşîra Sêvidî ne. Loma navbera du eşîran ji hev dibe. Û rokê li Çimana Biçûk sawa pezçêrandinê du eşîr dikevin hev û şerekî mezin dest pê dike. Xwûn belav dibe.

Elok vê dibihîze, li hesp siwar dibe, tê Çimana Biçûk û kitanê xwe davê erdê. Mêrên herdu eşîran jî li ser vê şer teva dikin û belav dibin. Bi sedan mêr bi hereketeka jinekê dawancên xwe cîhtînin û ji hev dûr dikevin. Va heketa li ba me qîmeta jinan hîn pir bi taybet dimîne û mînakeka berbiçav e.

Jin dayik e, evîn û bermalî ye, karkera malê û xebatkar e: bi qutayî Jin Jiyan e.

Jinên me, em şûnakin bi nivîsan û peyvan bidin naskirin.

Ji bo wê ez dixwazim bi etîmolojîyan du navên qedîm û bi taybet berdewam kim.

Bostan û Bodê

Ji kurikbûyîna min pê va min navê Bostan û Bodê pir bihîstibû. Navê dapîra min û navê bapîra dêya min jî Bodê bû, feqet maneya wê me nedizanibû.

Maneya Bostanê jî em gîştik baxçê heşinayî û zebze dizanin û min ew jî mereq kir, çima va nava li ba me pir û navdar e.

Min lêkolîn kir û agaheka pir balkeş dît. Navê Bostan û Bodê li bajarên din mîna Meletî, Semsûr û Meraşê û li alîyê Kurdistanê tunene, tenê li Qonyê û Enqerê heye. Li bajarên Anatolîya Navîn yên din jî ya tune ya jî qasê tilîyên destekî hene.

Li Enqere 199 Bostan, li Qonye 81 navên Bostan hene.

Li Konye 55 Bodê, li Enqere 16 navên Bodê hene.

Min xwast ez kokên va navan jî derxim û min fahm kir ku va herdu nav jî pir qedîm û taybet in.

Bostan peyveka Aryanî û pir qedîm e.

Bostan koka xwe ji Bûhn têye. Bûhn hem di zimanê Avestayî de hem jî di zimanên Rojavayê Îran de heye.

Li nav zimanên Rojavayê Îranê: kurmancî, talişî, zazakî, balochî, lurî , mazenderanî heye.

Bûhn li zimanê me çexê Bêhnê bû ye. Stan jî maneya xwe kon û cihgirtin e. Bostan bi rastî Bûhnstan e, yanî maneya xwe bêhna xweş, dera ku bêhna xweş jê tê ye. Jin li ba me weqes bi qîmet û heja ye ku me va navê qedîm û fodil daye wan.

Manaya Bodê jî dîsa pir bi taybet û qedîm e.

Ew jî dîsa peyv û navekî aryanî ye: di zimanê mazenderanî de, lurî û farsîya kevin de heye.

Koka Bodê ji Bûn têye û manaya navê Bodê jî ‘hêbûna me’ ye. Di ferhengên zimanên aryanî Bodê, bi Bûdî (بودی) derbaz dibe.

Li axzê Poladlî û Yûnaqê dibên Bodî, li axzê Cîhanbeylî û Qulakê jî dibên Bodê.

Me bi vê navê taybet gotîye ku ‘ jinên me hebûnên me ne û jin her tiştekî me ye. Jin nebû jiyan jî nabe.

Nav nasname ye, nav hebûn û heqîqata me ye.

Em hebûna xwe, bi ziman û bi navên xwe diparêzin.

ezî heftê salî me

roj meh û sal carnan tijî, carnan boş derbas bûn
demsal hatin û çûn
min nizanîkî ew jîyana min e
duh xewn, îro vîzyon û sibê hêvî ye
ramanên baş, hêkatên baş û karên baş
cesaret û dilnizmî ya entelektuel
ezî dimeşime
kûçikan ez gesnekirim
lê mirovan ez bi birin kirim
ez jî ne melayke me
jîyanê xwe bi agir û avê dişo
ezî heftê salî me û hîn jî bi zimanê xwe yî zikmakî şareza nebûme.
ezî ditirsim lê dev ji evîna xwe bernadim
ezî bi pirsên bêdawî re mijûl dibime
lê min nekarîye rîyêk dirêj herim
lê dinyaya min fireh bûye
bûyerên ku can û laşê min diwestînin
ez ê roja din bibînim ku ka çiqas bêwate ne
ezî muzexaneyên surrên xwe yên ku di dil û mêjoyê min de ne
zîyerêt dikim
şer û pevçûn ji min re dibêjin ku însanîyêt hîn negehiştîyê fezîletên
însanîyê
bi felsefê yê ku dibê cehenem yên din in
em ê bizinên gunehkar xulk dikinî
Ezî hewl didim ku fêhm bikim
mirov çawa têne xapandin
çing xwe dixapînin
çima herkî tên xapandin dibin xulamên zordarên şerbaz
ez bi îradaya azad bawer dikim
ezî heftê salî me û hîn jî meraq dikim û fêr dibime

Seyfi Doğan

Zayenda zarokan

Mehtab Îdelî

Ji rabirdûya mirovahîyê heta pêşketina teknolojîyê, ji bo ku mirov zanibin, zarokê di zikê dayika xwe de keç e yan lawik e, hinek rêbaz bi kar dianîn û hinek jî rewêj dikirin. Rêbaza ku jinên ducanî yên li Misra kevnar berî mîladê sedsala 14an ji bo ducanîya jinan û dîtina zayenda zarokê bi kar dianîn, pir balkêş e. Jinên Misrê ji bo ku bizanibin bi ducanî ye, jineka bi gumana ducanî û yeka bê guman, sibê zû bi torbek genim û ceh de mîz dikirin. Heger tovên jina ducanî, ji ya din zûtir şîn bibûya, wê gavê dizanin ku ew bi ducanî ye. Her du jî bi hev ra bibûyana, hîngê jî dizanin ku ne bi ducanî ye. Ji bo ku zayenda dergûşê bizanibin jî, genim û ceh dihate bikaranîn: Eger berê genim şîn bibûya zarok wê bibûya lawik, na ku ceh şîn bibûya, wê bibûya keç. Ev rêbaz ji hêla Prof. Juliet Mengerê di sala 1933an de bi heman rengî di labaratuarê de hat ceribandin û testa ducanîyê ya bi mîzê wekî ya Misrê hat pejirandin. Li ser vê yekê, testên ducanîyê yên îro têne bikar anîn û li gorî heman prensîban têne sepandin.

Helbet civakên din jî li gorî xwe gelek rêbaz û rewêj diceri-

bandin. Mînak li ba me: Piştî ku zarok di zikê dayika xwe de liviya, hinek av dikirin qedexekê û şîrê jineke ducanî didotine ser. Eger şîr daketiba bînî avê, keç, li ser avê bimaya, lawik çêdibû. Digotin ev herdem rast derdiket. Dayika min digot, gava ew ji bo min ducanî bûye, ev yek ceribandine û rast derketiye.

Wekî din jî gelek test û rewêjên din jî hebûn:

Gava hestîyê çengê bi goşt bûya, digotin keç e, bêyî goşt bûya û daniştîyaba, digotin lawik e.

– Soriçka gaz û çûlikan diavêtin erdê. Eger ew ne daniştîyaba ew ê bûbûya keç, daniştîyaba, dibû lawik.

–Dema qurban dihate serjêkirin, li ser rûvîya kwîr dihate pêdan. Eger ew di hundirê rûvîyan de bimaya û wekî xortum dirêj bûbûya, dibû lawik, lê



– Piştî kelandinê kelema sor, mîza jinika ducanî li ser dikirin. Eger rengê ava wê pembe bûya, dibû keç, eger mor bûya, dibû lawik.

– Ji awayên xwelivandina dergûşê dizanin, ka ew keç e an lawik e. Piştî livandinê, keç dixuşên, lawik pîn dikin.

– Ebe, dema dergûş di zikê jinika ducanî de çex dikirin, gava zik nerm bûya, digotin keç e, eger zik hîşk bûya, digotin lawik e.

– Serê mî an jî berxê dihate kelandin û piştra jî diqelişandin. eger şilava kesk a hundirê rûvîyan li ber wê biherikîbaya dibû keç.

– Sikura kinca dirûn şûnda, jina ducanî ew dikir bin jinûya xwe. Eger berê jinek biketa hundir, zarok wê bûbûya keç, na, mêrek biketa hundir, dibû lawik.

– Meqes, kêr dikirin bin mînderê, eger kesê ji der hatî li ser meqesê rûniştiba, zaroka wê dibû keç, li ser kêrê rûdiniştiba dibû lawik.

– Benekî dirêj bi gustîlkekê ve dihat girêdan û ew datînan ser zikê jina ducanî. Eger gustîlk li

dora xwe wekî helqe çerx bibûya, zarok ê bibûya keç, eger çep û rast, berjêr û berjor çerx bibûya dibû lawik.

– Piçek xwê bi dizî li serê jina ducanî dihate rijandin. Eger jinê berê devê xwe girtaba, zarok wê bibûya keç, eger destê xwe bi pozê xwe bikira, dibû lawik.

– Li beşa herî werimî ya zikê jina ducanî, piçek rûnê zeytûnê dihat rijandin. Eger rûn zû biherîkiya, dibû lawik, hêdî biherikiya, dibû keç.

*Û hê ji gor gelek xurafên mezinan dihat tehmîn kirin:

– Zikê xwe vêl û bilind be keç, eger tûj û daketî be, lawik e.

– Eger dilê jina ducanî bi taybetî serê sibê li hev bikeve, keç e.

– Eger jina ducanî pir hestiyar be, keç e.

– Eger xêza navika reş sirf li jêr be, keç, heta jor be, lawik e.

– Eger li serê memikên jina ducanî tarîbûn hebe lawik, rengê wê neguhere keç e.

– Eger lingên jina ducanî hertim sar bin û bicemidin, lawik e.

– Eger ji navê kîlo bigire, keç, ji qalçe kîlo bigire, lawik e.

– Mezinên me digotin, her-



– Keç bedewîya diya xwe digirin. Eger pizrik û leke li ser rû bikevîn, ew keç e, ger çerm bibiriqe û jina ducanî xweşik bibe, ew lawik e.

– Rengê mîzê birqok be keç, zelal be lawik e.

– Diya keçikê ji şîranîyê, diya lawik ji şor û tirşîyê ra nîvronîyan (newîranîyan) dike.

weha şiklê çavên jina ducanî tên guhartin û bijangên xwe dadinin.

Doxtorê sedsala 16an Jacques Gillemeau li ser Oftalmolojîyê xebatek wî heye. Li gora wî, di meha duyemîn de, bîbikên çavên jina ducanî biçûk dibûn, pêlûyên xwe dêdiwêzin û di quncika çavên wê de damarên biçûk diwerimin.



– Bi şikla panîya jina ducanî (herwiha ya pez jî) zayenda zarokan dihate tehmînkirin. Jinika Şingalî ji şikla panîya jinên ducanî têderdixist ka zayenda zarokan di zikê dîya xwe de keç yan lawik e. Tê gotin ku, pêşbînîyên wê hemû jî rast derdiketin. Mixabin ji ber wefata wê, me nikarî agahîyên berfirehî li ser vê metodê bi dest bixin.

– Li gor jimartina tizbîyê jî zayenda zarokan dihate tehmînkirin. Tizbî yek bi yek dihat jimartin. Eger hejmara dawîyê fer bûya, keç e, zo bûya, lawik e.

– Li gor falê, dema tiştên xerab dibûn, an jî dixwestin tiştekî bizanin an jî tehmîn bikin, pîrên gund li falê mêze dikirin. Ewê pîrikê milê xwe çepê heta enîşkê vedikir û digot; ‘‘Bîsmîllahî, fala Fetme nebîyê ye, li rîya qehbecî ye, li bin dara tûyê ye, tê dirêj werî, tê qut werî’’, bi destê xwe rast ji enîşkê heta serî tilîyê çewtê bost dikir. Sê– çar caran dihat gotin: ‘‘Ya rind be, rind derê, na dernê, na na ya rind be’’. Eger qut bimaya, jê derbasî nebûya, digotin, keç e, tilîyê rastê ji yên çewtê derbas bûya û dirêjtir bûya, digotin, lawik e.

– Li gor salnameya Mayayan, eger sala jidayikbûna jina ducanî û sala ducanîbûna wê jimareke cêv be, ew keç e, ew jimarek be, lawik e.

– Li gor salnameya çînîyan, dibe ku li pêşî, temenê jina ducanî li gorê vê salnameyê bê hesibandin. Salname ji berî zayînê heta sala 1945an li Çînê hatiye bikaranîn. Ev salname di hin salan de ji salnameya mîladî 11 roj(354 roj) kêmtir, hin salan jî derdikeve 384 rojan. Eger jina ducanî, di

roja destpêkê ya salnameya çînî de ji dayik bûbûya, hejmara '1' li temenê wê tê zêdekirin, eger ew di dawîyê de ji dayik bûbûya, ji bo texmînkirina zayenda dergûşê hejmara '2' tê zêdekirin.

***

Ducanîbûna jinan jî bi rêbazên curbecur dihate tehmînkirin û testkirin.

– Di sedsala 16an de ducanîbûna jinan şûna hekîman ji alîya kahînan ve dihat testkirin. Bi wan ra jî digotin kahînên mîzê. Wan jinên Ewropî dixapandin û wan bi baldarî ava jinan ya rojane, ya ku zer û xeynî dema ketina kincan dinêrin. Û reng û bîhna mîzê dinirxandin ku bibînin ka ew bi ducanî ye, an na.

Wekî beşek ji vê rêbazê, kahînan mîz bi şerabê ve tevlihev dikirin. Her çend belkî wan nizanibû ku ew çing çêbû, lê ew bi rastî, rastîyek zanistî bû: Dema ku alkol bi hin proteînên taybetî yên ku di dema ducanîyê de têne hilberandin, reaksiyonekê çêdike û hevgirtina mîzê diguherîne.

Ev teknîka muayeneya mîzê ku jê ra digotin, "uroskopî", ji Babilona kevnar vedigere û bi saya pêşveçûna Împaratorîya Romaya rojhilat, ji sedsala 5an heta nîvê sedsala 15an derbasî tibbîya Bizansê dibe.

– Li Yewnana kevnar, hekîm ji jina guman dikir ku ew ducanî ye, tewsîye dikir ku bi şev pîvaz an jî sebzeyên bi bîhna xurt têxin hundirê vajinayên xwe. Eger sibê bîhna pîvaz an jî wan sebzeyan ji nefesa wan bihata, ev dihat wê wateyê ku ew ne ducanî ne. Ji ber vê yekê ku hemî kanal vala ne. Lê eger bîhn nebe, tê wateya ducanîbûnê.

– Ya din jî ya ku di salên 1920an de bi navê "çerxa jiyanê" bi rêbaza tibbî ya hCG ve hatî sazkirin. Û ev îcad derfet da ku bi lêkolîna hCG ducanîyê tesbît

bike. Di vê rêbazê de li şûna çîpên mîzê yên heyî, hin heywan wekî kobay bikar anîn. Nimûneya mîzê ya ku ji jinê hatiye girtin, pê mişkekî mê ya hê biçûk dihat derzîkirin. Eger di mîzê de hormona hCG hebûya, mişk har dibû û ji hêla cinsî ve çalak û amade dibû. Di nava çend salan de şûna mişkan kerguh girtin. Ji vê testê re "Aschheim– Zondek" dihat gotin ku wekî testa A– Z jî tê zanîn. Testê %90 encamên rast didan, lê encamên wê çend roj digirtin. Û testê nikaribû di navbera celebek penceşêrê ya ku zû mezin dibe, ya bi navê Choriopithelium û hCG ji hev cihê bike. Ji ber vê yekê, ev ceribandin jî wekî rêbazek teşxîsa penceşêrê hat bikaranîn: ger nexweş ducanî nebûya, ew ne penceşêr bû jî.

– Zanyarê ji başûrê Afrîkayê Lancelot Hogben, rêbaz hinekî guhart û li şûna kerguh û mişkan dest bi ceribandina beqan kir. Awantajeke amfîbîyan li hember mişk û kerguhan hebû, ji ber ku hêkên wan pir hêsantir dihatin lêkolînkirin. Di dawîyê de, beqê embarê yê başûrê Afrikayê, bi navê zanistî "Xenopus laevîs," derket holê ku bi taybetî ji bo testa ducanîya mirovan maqûl bû. Dema ku beqê mê bi mîza jineke ducanî dihat derzikirin, beqê berîya rojê hêk dikir. Berevajî vê, beqê nêr bi hilberandina spermê bersiv dida derzîlêdanê.

Ew testa pir zûtir û serfiraztir di salên 1930an de li Ewrûpayê belav bû û beq bûn standarda vê testê.

– Kêm zêde, piştî pêncî salan, şîrketa dermansazîyê ya bi navê Warner– Chilcott di sala 1976an de testek çêkir. Ew test, jinan dikarîn bi 10 dolaran bistinîn û bi xwe li malê bikin.Test di 2 saetan de bi encam dibû û di encamên erênî de %97 rast derdiket. Bi karanîna xwe jî hêsan û erzan bû. Ev ji bo pîşesazîyê pêşkeftinek bû û hem jî bingeha testên ducanîyê danî. Hilberîna vê testê, li gorî despêka salên 1970an dema ku rêbaza nîşankirina radyoaktîfê ji bo tespîtkirina hormona hCG hate bikaranîn, rêbazek girîng e.

Û hê jî bi dehan testên ku di nav gel de hatine ceribandin û bawerkirin:

– Sibê bi zikê birçî: du qaban yekê şekir, ya din mîz dikirin. Dû re berdidan ser hev, ku eger şekir di çend deqîqan de bihele dihat zanîn, ku ew jina bi ducana ye, nehalîya, ne bi ducana ye.

– Testa ya sirf bi mîzê: Qedexek mîz tê danîn û 24 saetan li bendê dimînin. Eger qatek zirav li ser mîzê çêbibe, ew kes bi ducanî ye, ger çênebe, ne bi ducanî ye.

– Bi sîrkeyê: Qabeke sîrke dikin û mîzê tevê dikin. Ger reng biguhere ew jina bi ducanî ye, neguhere ne bi ducanî ye. Bi eynî awayî bi karbonat û soda û bi macûna didanan jî dihat kirin.

– Bi şîr: Qedehek şîr tê kelandin, 4– 5 dilop mîz pê de tê çilkandin, 1– 2 saetan tê sekinandin. Eger şîr biqete dihat wateya ducanî, eger neqete ne ducanî ye.

– Bi tilîyê: Ebe û hekîman bi tilîyên xwe malzarok muayene dikirin, eger hişk be ne ducanî ye, ger nerm be tê wateya ducanî ye. Ev forma muayeneyê îro jî tê bikaranîn. Û him jî bûye rêbazek ku ji bo tenduristîya dayik û dergûşan.

– Bi qalişkê: Çend pelên qalîşkê dikin qabekê, dûre bi ser de mîz dikirin, ger rengê qalîşkê sor bibe tê zanîn ku bi ducanî ye, ger reng neguhere ne bi ducanî ye.

– Bi sabûnê: Li ser çend parîyên sabûnê mîz dikin, ger bilqiq çêbibin bi ducanî ye. Ger çênebin ne bi ducanî ye.

– Bi leymûnê: Leymûnê dikin qabekê bi ser de mîz dikin, heke rîs û tîrêjên xwe dakevin binî, bi ducanî ye, heke li ser bimîne ne bi ducanî ye.

– Bi mandalê: Ya ku di sedsala 15an de di ansîklopedîya jinan de hatiye nivîsandin.

Hundirê teştê mandalek dikirin, dûre bi ser de mîz dikirin. Nêzî 4– 5 saetan şûnda mîz dirijandin. Eger îza mandalê li binê teştê derkeve bi ducanî ye, derneket ne bi ducanî ye.

– Carinan jî kesên bi hestên xurt, wekî pêşbîn û kahînan, ducanî pêşbînî dikirin. Hê jî haya jina ducanî jê tuneye, bi nêrîna rû û destdana zikê wan tehmîn dikirin ku bi ducanî ye. Û dihat gotin, bi piranî jî rast derdiketin.

– Mezinên me digotin: Jinika bi ducanî bîhna zîstanîyê jê tê.

***

Helbet ji bilî wan hemûyan divê em rewşa bêsûdîyê jî ji bîr nekin. Nebûna zarokan ya jin û mêran, berê pirsgirêkek mezin bû. Wan û mirovên din ew wekî kêmasîyekê didîtin û dilê wan pê dişewitîn. Hinek navên wek ocaxkwîr, bêsêdî û hwd. li wan dikirin. Hem ji bo xwedîbûna zarok û hem jî ji bo xilasbûna ji vê rewşê, gelek rêbaz dihatin ceribandin. Hekîm û ebanan ji bo dermankirinê ji giyayan derman çêdikirin. Zexikê Bêrem, tolik, silmastik, pung, kirksinir berhev dikir û dikeland. Ardê ceh, zeyd tevlê dikir, paç an naylon radixist û li ser dikir. Jina ku bixweze bi ducanî bibe, dida ser zikê wê û ew sê– çar saetan di nav derman de dima. Pişt ra av dihata kelandin û jinik didane ber helma avê. Hirîya bi xwêdan li ber tavê dihate raxistin, hinek av lê dihate rişandin qenc şil dikirin. Paşê ger hirîya şil ne bi xwêdan ba, zeyt tevlê dikirin û ew li dora zikê jinê dipêçan. Wê hêjîr û zeyt tevlihev dikir û pê dida xwarin. Esma Oskê jî jina dixwazî bi ducanî bibe, bi nigekî wê bi banî serûbinî bi dar de dikir da ku ma kanalên zayînê vebin. Hinekan jî, qalîkên pîvazan dikelandin û hinek ava wê bi wê kesê didan vexwarin û li ser helma ya mayî jî ew kes didan rûniştandin. Hin jinan jî pişta terikîna kincan, diwînê pêz wek fitîl bi xwe ra hildanîn da ku kanalên wan bên vekirin. Helbet divê em kesên ku li gorî bawerîya xwe diçûn ba mele, kahîn, alîmê dînî, ocax û sêhrbazan û li çareyan digerîn jî ji bîr nekin. Tê gotin ku, mele berbejn dikirin ku ma zarokên wan çêbibin. Ji bo jina ku dergûşên xwe ji ber çûyî jî, mele li ser benekî dixwend,

girêdida û digot: piştî serşokê li dora nava xwe girê bide. Wan jî bawerîya xwe pê dihanî û ew tişt dikirin.

Lê mixabin îro em zêdetir bi vê pirsgirêkê ra rû bi rû ne. Em dibînin ku di salên 1980an de pirsgirêka bêzarokbûnê ji %5 bû, îro li cîhanê ji %10– 15 zêde bûye û zêdetir jin û mêr bêtir serî li rêxistinên tenduristîyê didin. Di nav sedemên herî giring ên ku di bin vê yekê de, bandorên neyînî li ser sperm û hêkan, yên ji ber adan û toksînên ku li hawîrdora me ne ku em lê dijîn. Ya din jî hilketina temenê zewacê ye.

Îro bi pêşkatina tip û teknolojîyê va, çareyên curbecur ji pirsgirêkên wiha re hene. Hin ji wan dermankirinên xwezayî ne û hin jî bi Fertilîzyano in vitro(IVF) ne ku ew çareya dawîn e. IVF ew prosedur e ku ji kesên bi pirsgirêkên zayînê ra dibe alîkar ku bibin xwedî zarok. Bo dermankirina IVF, hêkek ji hêkên jinê tê derxistin û di laboratuarê de bi spermê tê fertilîzêkirin. Paşê hêka fertilized paşî vedigerin nav malzaroka jinê ku mezin bibe û pêş bikeve.

Bêguman, hertişt bi pêşveçûna teknolojîyê ra hat guhartin:

Testên ku dikarin li malê bi xwe bikin, êdî pir hêsan û erzan bûn. Û pir zû jî encam didan. Îcar tibb di vî warî de pir bi pêş ket. Bi ultrasyonê û ceribandinên cûrbecûr wekî testên, non–inzaziv prenatal(NIPT), amniyosentez, koryon villus (CVS)û hwd. Him ji bo zayenda zarokan û him jî ji bo tenduristîya wan berî ku dergûş çêbibe, ew hemû tên test-kirin û fêrkirin.

Zayenda zarokan ji kromozoman pêk tê.

Eger hêka jinekê bi sperma <<**X**>> kromozoma hilgirê, zayenda zarokê dibe keç, eger bi kromozoma <<**Y**>> hilgirê, dibe lawik. Ji 46 kromozonan hemû <<X>> e (yanî 46XX)

keç e, (46XY) lawik e. Mirov dikare bibêje ku hêla diyarker <<kromozomên di spermên mêran>> de ne. Paşê gora kromozoman hêlik û hêk çêdibin. Piştra, ew ji hêla bandorên hormonal û genetîkî ve xuyabûna nêr an mêr tê diyarkirin. Organê genîtal ên zarokan piştî heftîya şeşan dest pê dike û wek kulmek (kurmekî) çêdibe. Heta dawîya hefteya 9emîn heman xuya dike. Organê der yên ku wekî organên zayende têne îfadekirin, yên mêran penis û scrotum, yên jinan klitoris û labium, ji hefteya 11an dest bi cûdabûnê dike. Heta heftîya 12emin lawikan penis û keçan jî hêk û malzoraka xwe çêdibin û şikil digirin. Zayenda zarok piştî hefteya 14emîn tê diyarkirin. Lêbelê, doxtor wênekirina di 16 hefteyan de ji bo diyarkirinê teqez munasib dibînin.

Û her wiha bi rêbaza IVF zayenda zarokan jî tê hilbijartin. Di dema veguheztina embriyoyê de tenê embriyoyên saxlem (PGT) û ên cinsê xwestî di malzaroka jinê de têne çandin. Tiştekî ecêb e ku Pakistan di derbarê hilbjartina zayenda IVF de welatê yekemîn e di vê tedawîye de. Bi piranî xelkê xwe misilman e û li gor bawerîya wan ne kêşeyek e. Lê dema ku tê xwestin bi tedawîya IVFê zayenda zarokan tên hilbijartin. Dûre welatên wekî Yewnanîstan, Kanada, Dubaî, Hindistan, Qibrîs û Tirkiye tên.

Ji bo ku xweza hevsengîya xwe biparêze, hejmara kur û keçên ku têne dinyayê hema hema nêzî hev in.

Ez dibêm, bila hevsengîya xwezayê xera nekin û bijartina zayendê ji xwezayê ra bihêlin!

Danişt: Tîk sekinîn
Oftalmolojî: Celebek zanistê ku li ser avahîya çav û nexweşîyên ku di çavan de rê didin lêkolînê dike.
Qehbeci: Rêwî
hCG: Human Chorionic Gonadotropin.
Kerguh: Kêvroşk
Dêwistin: Daleqîn, daliqandin.
Amfîbî: Amyara ku hem li bejahîyê û hem jî di avê de dikare bijî.
Berbejn: Nivişta ji bo xwedîbûna zarokan ji alîyê mele ve hatiye çêkirin.
Scrotum:Kîsika gunan
Zo: cot
Fer: Tek

Xeyala zimên

Rojvan Enes

Tu bi kurdîya akedemîk dizanî? Ev pirs li her derê tê bihîstin. Hema hema ketîye devê herkesî. Û divê bê gotin ku gotineke şaş e. Çima şaş e? Çawa ketîye zimanê me? Em ê di vê nivîsê da van pirsan bibersivînin.

Zimanê akademîk; ew ziman e ku xwedî têgehên taybet e. Ev têgeh jî li gor her beşî tên guhertin. Zimanên akademîk di nav zanyarên hevkar da tên bikaranîn. Çi edebîyat be, çi matematîk, çi erdnîgarî û hwd. Dema mirov bi hûrgilî mijarekî rave dike; zimanê rojane ji bo derbirînê kêm dimîne. Ev kesên zanyar jî ji bo bikarin xwe îfade bikin têgeh û peyvên nû çêdikin. Ev peyv tenê di nav wan kesan û di civata wan da tên zanîn. Hûn niha herin gotareke derheqê matematîkê bixwînin hûn nikarin jê fahm bikin. Ji ber ku zimaneke akademîk e.

Wek me dît; zimanê akademîk ji bo mirovên ji rêzê zimanekî zehmet e. Û perwerdehîyekê divê. Li gor min ji ber vê yekî ye ku mirov dibêjin kurdîya akademîk. Ji ber ku ew ji vî zimanî fahm nakin. Lê mesele tenê ne fahmnekirin e.

Meseleya din jî ji perwerdehîya me ya tirkî tê. Ji ber ku me pêşî bi vî zimanî perwerde dî, em berawirdîya her zimanî li gor tirkî dikin. Çawa ku tirkî devokên xwe kuştine û ew tenê bûne dezgehên pêkenîn e, çawa devoka Stembolê kirine devoka standart û fêrî herkesî kirine, em kurd jî ji bo kurdî heman tiştî dixwazin. Dema kurdek fêrî kurdî dibe ji devoka xwe dûr dikeve. Çawa ku tirk dema bi tirkîya Stembolê diaxivin xwe biserketî hîs dikin. Kurdên me jî dixwazin ji devoka xwe dûr bikevin û bi vî awayî zanîna xwe nîşan bidin. Lê ev ji alîyê gel ve nayê qebûlkirin. Kurd vê qebûl nakin. Dema hûn ji devoka xwe dûr dikevin gel jî ji we dûr dikeve. Him hûn naxwazin ew ji we fahm bikin him jî ew naxwazin we fahm bikin. Û di vê navberê da kurdîya akademîk diwelide. Ji ber ku stranbêj yan jî sîyasetmedarên me ji devoka xwe dûr dikevin, xelk jî vê, wek kurdîya akademîk bi nav dike.

Em niha jî pênaseya zimanê standart bikin. Zimanê standart ji bo kurdan tê çi wateyî? Em kurd ji ber ku tu caran di bin banê otorîteyekî da nebûne yek; zimanê me jî ji vê bêpar nemaye. Wekî civaka me zimanê me jî tu caran nebûye yek. Helbet heta sed sal berê ev tenê ne ji bo me ji bo hemû miletan wisa bû. Lê çawa ku piştî şoreşa frensayê serdema netewedewletan dest pê kir ev rewş guherî. Her miletî wekî civata xwe zimanê xwe jî kirin yek û standardek dîyar kirin. Bi xêra zimanê standard civakê peywendîyên xurtir anîn meydanê û dewletên xwe jî bêtir bi pêş xistin. Lê ji bo me hemûyan eşkere ye ku kurd û kurdî ji vê konaxa pêşketinê bêpar man. Û her yek ji me bi awayeke cuda fêrî vê konaxa nû bû. Vê jî kir ku em bêtir ji hev dûr bibin. Piştî ku min ev gotin kirin îcar ez ji we bipirsim; zimanê standard çi ye?

Zimanê standard: Ew zimanê ku ji bo peywendîyên civakê xurtir û hêsantir bibin, ji bo ziman bihêztir bibe, ji hemû dewlemendîya wî zimanî sûd werdigire û bi vê dewlemendîyê zimaneke hevpar çêdike.

Zimanê standard sed sal berê ji bo her miletê hewce bû. Îro jî hewce ye. Her çiqas em dereng mabin jî ji bilî vê tu rê tuneye.

Lê zimanê standard nayê wê wateyê ku em dev ji devoka xwe berdin. Berovajî gerek em devoka xwe bernedin gerek em wê rast bikin. Zimanê standard ne zimanekî nû ye! Zimanê standard devoka we ye! Dema hûn ji vê devokê peyvên biyanî derbixin. Ji devok yan jî ji dîyalektên din peyvên xwemalî bikarbînin ev dibe zimanê standard.

Divê nayê jibîrkirin ku her ziman tê guhertin. Heta sed sal berê ev guhertin sirûştî bûn. Lê îro her milet bi xwe dîyar dike ku zimanê xwe wê çawa biguhere. Kurdî jî li Kurdistanê û li Anatolîyayê bi gelek neteweyan ve danûstandin kiriye, gelek rastî guherînên sirûştî hatîye. Lê îro dem hatîye ku em bi xwe qedera zimanê xwe dîyar bikin. Em li gor daxwazên xwe teşeyeke nû û nûwaze bidin zimanê xwe.

Divê em wer bikin ku her kurdek ji hevdu baş fehm bike û bêtir nêzî hev bibe.

Raveyeke hîn eşkere bikim. Em bêjin min peyveke nû hewisî. Ev peyv "dibistan" e. Dema em kurdên Anatolîyê û kurdên berferatî vê peyvê bi lêv bikin, em ê bêjin "dibiston". Lê dema em binivsînin wek herkesî em ê jî "dibistan" binivsînin. Yanî yê dixwazim bêjim ji bo hûn vegerin ser koka xwe gerek hûn ji xwe dûr nekevin. Ancax em dikarin bi rêya devoka xwe vegerin koka xwe.

Ji bo devoka berferatî mînaka çend peyvên nû û bilêvkirina wan:

Pêwendî = Pêwandî,
dibistan = dibiston,
mamoste = momusta,
temaşevan = tamoşavon,
nivîskar = nivîskor,
xwendekar = xondakor,
Kurdistan = Kurdiston,
xelikan = xalikon,
bîrnebûn = bîrnawûn,
gotar = gutor û hwd.

Dengê gundê min - II

Xoyratînê Mihemmedî Seîd (Hayrettin Güven)

Gundê Omera gundê min e. Gundekî ji eşîra rêşîyan e. Girêdayî Kulu (Qûlek), Konyayê ye. Piranîya gundîyan li Ewropa dijîn. Belkî bîsthezar kes li gund hene di mehên havînê de.

Bazarêk xirab, wek gundêkî xirab…

Salên min yan 10 yan jî 11 bûn.
Her heftî rojekê bazar vedikirin li çarşîya gund. Bazar wê çaxê li ser rêya li ber mala kalkê min Hecî vedikirin. Me wi kalkê xwe re ne digot Hecî, me digot Ewo. Hemû bazarwan (bazarcî) mêr bûn. Hemû kesên ku tên bazarê jî yan mêr yan jî pîrek bûn. Tu keç û bûk tunne bûn. Eyb bû ku kecik û bûk werin bazarê. Keçik û bûk li malan vedişartin wek tiştek baha giran. Min bi eqlê xwe ye kurrik weng didît. Çima nizanim lê car caran gotinên nexweş dihatin gûhên min. Li civakek ku keçik û bûk he yî ew gotin eybek mezintir bû. Ji ber dû û sê çavpêlan nîvê gund li mal hepis bûn.

Salên min yan 23 yan jî 24 bûn.
Min li Zankoya Hacettepe dixwend. Rojeka havînê germ bû. Kela kel bû. Qe te digot ewr dişewîtandin. Wê rojê li zankoyê Koma Dengê Azadî konser dida.

Qet ji bîrnakim ji ber ku digotin: 'Ew gundê ku keçik û bûk ti de tunneyî ew gunda jî xirabê ye'.

Bazara me xirab bû. Gundê min xirab bû ji ber ku di hûndirê vî de tu keçik û bûk tunne bûn. Hûndirê me dişewîtî. Dilê me dipertilî.

Roja ku ez bûm kurd…
Salên min yan 16 yan jî 17 bûn.
Min li lîse ya gund pola 2ya dixwend. Rewşa min her dem baş bû li mekteba. Car car yekemîn car

car dûyêmîn di bûm li tevahîya mektebê. Bi limê û awdest jî bûm. Îslam çareserîya her derdî bû gor minç Lê misilman ne îqtîdarê bûn. Me Erbakan digirt. Dîsa jî min dizanî ku şervanên kurd hebûn li serî çîyan. Min jî wek dewletê ew terorîst didîn.

Roja dawî ya salê bû. Min biryar da bû ku sala ya lîse paşî li Enqere bixwînim. Li fersendêke digerîyam ku ji mamosteyê xwe re bibêjim ku ez dixwazim ji hemû hevalên xwe xatir bîstinim.

Mikrofon di dest Mamoste ya Dîrokê Sahre de bû. We ji min hez dikir. Yanî min weng dizanî. Ez çûm cem mamoste û min di ber gûhê we de got: 'Mamoste, ez dixwazim ji hevalan xatir bixwazim ji ber ku ez têrim bajêr sala te.' Qey min digot ew ya bêji 'Pir xemginim Xoyratîno. Tu şagirdê min herî başî. Aha bigre mikrofon ye te ye'.

Lê xwelî li serê min, Sahre mîkrofon ji min dûr girt û di bin gûhê min da bi dengê kî pist a pist got: 'Tu tiştên tehlîkelî tu nabêjî, ne weng e?'.

Min fêm kir ku ew behsa ew kesên ku li ser çîyane behs dike.

Min got 'Na, Ezê tene xatir bixwazim.'

Lê tofanêk teqîya li ser serê min. Ji tirkan re ferq nedikir tu kî yî. Heger tu kurdî tu şagirdêk baş jî bibî, şervanên serî çîyan wek terorîst jî bibînî ew te potansîyel terorîst dibînin. Tu wan bira nebibînî jî ew we wek bira dibînin.

Ez wê rojê bûm kurd. Ji ber ku ez ji wan re tene kurd bûm. Tu bîr û bawerîya wan bi min tunne bû. Wana ez kirim kurd.

Salên min niha 49 ne ez hîng jî kurd im, mala Xûdê hezar carî awa be.

Êrîşî malbera me hatiye kirin.
Em li ser kar dikin, ji nêz de ji nûve amade bikin.

Redaksîyona kovarê

Newroza 1979[1]

Nureddîn Zaza

«Newroz!
Roja nû
Roja şikestina zivistan
Dawiya berf û serman,
Roja hatina bihar
Li Kurdistan:
Şînahîya erd û dar,
Reva demên tarî,
Şevên xedar.

Di vê rojê de bû
Ku Kawe kire hewar:
Xelk gihan dora wî
Çi dewlemend û çi jar
Ji bo pelixandina Zehakê har.
Bi wî awayî,
Zorkeriya tebiyet û beşer
Bi yekewe hate xwar;
Dinya, bi ken û şahî
Ji kurdan re bû dost û yar.

Îro, bê Kawe,
Û bê yekbûn,
Em li her der
Bindest, zebûn.
Li hev keti ne
Marksîst,
Sosyalîst,
Behdînanî,
Şivanî
Û sorani
Bi navên têvel,
Berberiya hev dikin,
Wek eşîrên berê
Li hev dixin
Bi çavsorî û meranî.

Ma ji vê nexweşî re
Peyda nabe derman?
Dermanê yekîtiyê
Biratiyeke bi wicdan:

Alîkî deynin
Bend,
Partî
û
Mezheb û felsefe,
ji bo azadî
û bextîyarîya kurdan!«

---

[1] Bi munesebata Newrozê, birêz Jordan ji arşîva xwe ev helbesta Nureddîn Zaza ji kovarê re şand. Bi çapkirina vê helbesta nemir Nureddîn Zaza em wî bi bîrtînin.

Xwedîyê Edeletê -II

Mistefayê Nurî

Daweta Pêxembera li Eqebê cara siftê kirî, Tiştê ku pêxemberan li Eqebê cara siftê kirî, li wê civînê, bi çi şertan Pêxember teslîmî wan kiribû, ew axaftinên nemir, hîcret, fetha Mekkê, Heca Wedaê koça Resûlullah ji dinyayê, xelîfetîya Ebûbekir, di pey mirina wî xelîfetîya Umer û hewldana wî ya ji bo îşên Ometê… Giştik anîn bîhra xwe.

Geh hesreta wundabûna Resûlullah û hevalên wî ji dilda kaş dikir, geh roja Fethê, geh pêşveçûyîn û rewşa ometê ku hatî pê difikirî û xew nedikete çavên wî.

Germa rojê, şûna xwe, ji çîksayîya zehf sar re hiştîbû. Fikirî ku Umer jî wek wî neketibe xewê.

– Ez herim hinek li ba Umer rawestim, go û ji mala xwe derket. Kolanên Medînê tenha bûn. Ka kesek tê û tere, li dorhêla xwe dinhêrî û bi rê de diçû.

Gava dit ku di şevereşê de, yekî bi kincên sipî, ber bi wî dihat. Ew mirovê wek heykel, pîyên xwe direjî Umer kir û bi sermilên wî girt. Ebbas go:

– Ev tu yî, ya Umer? Wilo di derenga şevê de tu ku ve terî?

– Ez im, ya Ebbas, ey apê Resûlullah! Ez derketibûm sehîtîya taxan û doralîya Medînê. Were, em bi hev re bigerin.

Umer diçû, Ebbas diçû… Bêdengîya şevê, bitûnî toqîna xwe berdewam bû. Dengên kûçikan ji taxên Medînê tek tûk dihatin û bêdengîya şevê difelişandin.

Umer, li ber her malê radiwestî û guhê xwe dida ser. Yên di hundir de bêxeber bûn.

Tiştekî ku asayîşê difelîşe, tiştekî ku tengahîyê dide heye, an tuneye. Bi vê berpirsiyarîyê, derîyekî ku guh lê nekirî, nehîşt.

Ji nişka va rawestî. Ev çi ye? Li kenara Medînê, ji konekî dengê zarokên dinalîn û digirîn, dihat. Vegerî ser kon.

Li ber kon, rûyê jinepîrekê xuya dikir. Li ber agirdankî rûniştîbû û beroşeka li ser agir tev dida. Ji zarokên digirîn re weha digot:

– Megirîn zarokên min, şîva me niha dikele!

Ewna haş dikirin.

Umer û Ebbas, gavê bi dizikî lê sêr kirin. Lê, şîva li ser ocêx, welhasil nedikelî. Zarîn û hewara zarokan hundirê Umer dişewitand. Xem û êşeke kûr hîs kir. Silav da û nezikî kon bû.

Jinepîra reben, bi rûyê ken silava Umer hilda, mêr go:

– Xaltî, van zarokana ji bo çi digirîn? Pîrejinê go:

– Îro va du roj in ku birçînin.

– Lê evê ku tu dikelinî çi ye?

– A lawê min, ji ba te ku ew şîv e? Di hundirê beroşê de bes av û kevir hene. Ez wan haş dikim, nebe ku têkevin xewê. Lê, çare nîne, rebenan ji birçitîyê nikarin razin.

– Pekî, mêrê te, lawê te, xalê te, birayê te jî tunene? Pîrejinê go:

– Gîştik mir in. Kesekî min tune.

– Ev piçûkana yên kê ne?

– Nevîyên min in.

– Çiqas jî pir in. Tu biçûya û te xeber bidaya Umer, nedibû?

– Xelîfe Umer ha? Xwedê bela xwe bide wî. Xelîfe wisa dibin? Wekî ku em amenetên Xwedê danê wî. Carekê jî were û li hâle me bipirse nabe?

– Heqe te heye xaltî. Rebenê min nikare were, gelek xebatên xwe henin. Hemû îşên ometê ji wî tê pirskirin. Wext nabe ku were. Eger ku te ew bi xwe agahdar nekir, nizane.

– Nizane ha? Mafir ku ji halê me agahdar nabe, çima bûye xelîfe? Tikayên wisa pûç kî qebûl dike? Gelek xebatên wî henin… Tu here şer, li welatê Misirê bigere, xenîmetê bîne, xelkê Medînê birçî bihêle, xenîmetan bi hinên din ve par ve bike, yên ku li ba te jî ji ber birçîbûnê dimirin nebihîse! Îşên ku te gotî, vana ne?

Girîna zarokan û hengameya wan wek xençerekê di singê şevê re diçû xwarê. Tu bêjî ku ne di sîngê şevê re, lê di sînge Umer re diçû xwarê.

Jinepîrê, lomên xwe bere bere dadigerand nifiran. Nedizanî yê ku li hember wê rawestî Umer e, lê gotegot dikir:

– Ya Umer! Va bergerînana, van nalînana ê tev ewran bin, bibin

birûsk û bi ser serê te de warin xwarê. Nifirên sêwîyan, dua baranê zan meke! Ew a wek birûskê bi ser serê te de were xwarê.

Ez biçûma û min derdê xwe ji Umer re bigota? Ez parsek im? Umer çi mêr e? Bavê min ji wî hîn zêdetir comerd bû. Ez naçim, li ber xelîfeyê we nagerim.

Umer li ser va şora paşî, tu bêje nedîtin ku bêje. Soz, ber de ma. Rawestî û go:

– Heqê te heye xaltî. Ez ê niha herim û bi şûve vegerim.

Umer li pêş, Ebbas li paş, ber bi ambara zexîrê, di şevereşa şevê de diçûn. Her ku lingên wan li keviran diket û deng didan, kûçikên taxê êrîşê wan dikirin. Lê Umer guh lê nedikir.

Bi kolanên Medînê zirav û xwar re tu bêjî ku bi dest û lepên xwe diçûn.

Dawî, hatibûn ambara zexîrê. Umer go:

– Ya Ebbas, bi min re were.

Di ambara zexîrê de zar zor mûmek dîtin. Çav li dorhêla xwe dan. Çewalek ard û hinek jî rûn di kûzekî de dîtin. Umer go:

– Ya Ebbas! Vî çewalê ard li piştа min bar ke, tu ji rûn bigire em herin.

Ambar kilît kirin û derketin. Rêya wan dirêj, barê wan giran bû. Ebbas go:

– Ya Umer tu çewêl bide min, ez bikşînim.

Gava ku Umer va bihîst, wek ewrê ku barana xwe vala bike hundire xwe vala kir. Him diçû û him ji bîhna xwe qut qut digot:

– Çewêl tu bikşinî ha? Ez çi me? Westîbûn ne, ez bimirim ji tu çewêl ji min mexwaze. Te gotinên jina pîr nebihist? Li roja heşrê kes gunahê kesî nakşîne û kes nabe ortaxê gunahê min. Belê, bila nebûya xelîfe. Mafir bû, ji hertiştî mesûl e. Li kêleka Dicleyê, gure çiyan, ku miheke pêve, edeleta Xwedê, wê ji min pirs dike. Hemû tiştên ometê, di bin berpirsiyarîya min de ne.

Xanîyekî bêxwedî bixele, yê ku di bin de bimê Umer e. Li ser erde dilopek xwîn birije, ew xwîn ê bibe girdab Umer ê tê de bifetise. Ku Umer xelîfe ye, kî mesûl e?

Denge Umer bere bere kelagirî bûbû. Niha dengkirina xwe ne ji Ebbas re bû, lê ji Xwedê re bû:

– Umer çawa bike Îlahî! Beşer ku wilo cahîl, wilo zalim bû, ê çawa bibe? Ên ku ji Muhemed dihat xwastin, ji Umer têne xwastin. Ax Umer ax! Van barên ku tu nikarî

bikşînî, te çima wegirt ser pişta xwe?

Ebbas go:

– Lê ku te wernegirta kî ê bihata û va barê giran wergirta ser xwe? Kesekî ji te hîn bêtir îdare bike heye?

Tu li edeleta heqîqî digerî, tu ne Umer, çi bibî bibe, nikarî bi cih wunî. Edeleta heqîqî, encax li roja meşherê heye. Ey Umer, tu ne melek î, ne jî Emîrê zalim î. Ji destê te ve çi tê? Di xulqa însanan de rewşên wusa henin.

Li saeta vê şevê, hemû stêrikên esmanan ji Umerê ku di bin bar de dinale re, şahîd in. Ka tu bi va destên ard û rûyê xwe derkeve huzura Xwedê, erd û esman çawa li te şahîdî dikin, bibîne.

Umer wek hinek teselî û nerm bûbû. Gavekê dengê xwe birî, paşê go:

– Rê hê pir e?

Ebbas bersiv da:

– Na, pir hindik ma.

Dermanê junîyen Umer tu bêji ku hat birinî. Gavekê şuva bi hilmehilm gehişte kon.

Zarok geh digirîn, geh dengê xwe dibirîn. Jinepîre ji, zû ve beroştevdan cî hiştibû.

Umer hema ew keviren di hundire beroşê de vala kirin. Ji kşz rûn derxist û kir beroşê. Rûn, hinek wek heliyabû ku piştî wê Umer ard tevlêkir. Lê êzingê bin ocêx tu nema ku vemirin. Ji bo kelandina şîvê, hineki din lazim bûn. Umer go:

– Xaltî, tu şewateyê din tuneye?

Jinepîre, çend sirî û devistanên şil anîn. Umer ji bo agir vêxîne, bi temamî li erdê xwe dirêj kir. Bi pifkirinê, tu bêji ku bi rihên xwe erd reş dikirin. Nihayet zar zor şîv kelîyabû.

Zarok li serê beroşê civîbûn û destên xwe davêtin şîva kelî. Umer ji bo ku manîê wan be, qabeke gir û fireh anî, şîv vala kir hundirê qabê. Ji şîva kelî hindik hindik bi destê xwe digirt, pif dikir û dida devê zarokan. Zarokan jî wek çêleyên çîvikan awaz awaz şîv dixwastin. Ê ku şîv diket dêv, dengê xwe dihat birîn, yên din jî bêsebir çavnêrî dikirin. Jinepîr û Ebbas jî alîkârî li Umer dikirin.

Girîyê zarokan hatibû birîn û kêfa wan hatibû şûnê.

Westina Umer ji, çûbû û rehetî hatibû canê wî.

Di nav koşîn û lebitînê de şev çawa derbas bûbû nizanî. Bi birânîna Ebbas, hişê xwe hatibû seri. Ebbas go:

– Sibe dibe ya Umer, haydê em herin. Umer go:

– Raste, divê em alaz bidin,

herin. Lê xaltika pîr derket hat. Umer go:

Xaltî! Sibe nîvro were min bibîne. Ez halê te erzê xelîfe Umer bikim.

Her du dostên mezin, piştî nimêja sibehê, daketin mala Umer. Pişti wextekê ro hatibû nîvro. Jina pîr derket hat. Umer bi rûyê ken go:

– Xaltî, herhal tu vê êvarê bêxew mayî.

Jina pîr, va denga nas kir. Ew mirovê ku bi êvarê hatî, Umer bû. Umer li gotina xwe berdewam bû:

– Her meh bila tu werî, mehmengîya xwe ji vir bistînî.

Pişti ku va got, jina reben, bi rewşeke mehçûb, lê dîsa jî bi xîret go:

– Belê, te niha edeleta xwe şanî da. Xwedê te biparêze! Li te alîkarîye bike, lawê min! Ez derheqê te de xelitîme.

Era Umer, era serokê dewletê

Sal bi serketinan derbas bûn. Dinya, bi edeleta Umer şenahî bû.

Lê rojekê, yekî ji însanên ku ji Rebbê xwe re nankor, gotibû:

"– Ez ê ji te re aşekî ba wilo çêkim ku heta qiyametê bila bibe destanê zimanan!"

Û wî nankorî, li ser secdeya nimêjê xwedîyê edaletê xençer kir.

Umer bi birîndarî ji dostên xwe xatir xwast û çû cennetê.

Xwedê ji wî razî be! Amîn.

*T.C Başbakanlık Osmanlı Arşiv Belgelerine Göre Ankara`da Bir Kürt Köyü **MİKAİLA** İnler Katrancı*

Tiştê ku di vê pirtûkê de, li erdnîgariyên cihê tê vegotin çîroka kurdan e. Kurd li ku derketine, ji kuderê re derbas bûne û li ku bûne. Êşa gelê kurd ku li herêmên wek; Xorasan, Belûcistan, Hewreman û Kirmaşanê û ji aliyê din ê Asya Navîn heta Pakîstan û Kafkasyayê, li Mezopotamya, Sûriye, Filistîn, Misir, Sûdan, Lîbya û Cezayîrê; dawiya rojavayê Balkanan li seranserê ciyê ku lê dijîn û belav bûne, serûvena wan a sirgûnê, hêvî û doza kudan di vê kitêbê de em dibînin. Kitêp ji alî Dr. Fikret Yildiz ve hatîye amadekirin û weşanxaneya Apecê ev weşandîye. Li ser malpera Makpirtûk tê firotin. https://**makpirtuk.de**



Kazo çima dîn bû, ji neh kurteçêrokên kurdî pêk tê. Ji alîyê Halil Mirzan Küçükyıldız ve hatine nivisandin. Kitêp 60 rupel e. Nivîskar heta ji wî hatîye xwestîye kurmancîya devoka reşîya bi kar bîne. Naveroka hîkayetên vê kitêbe ji serborîyên kurdên ji Anaotolîyê yên li welêt û li Danîmerqê derbasbûne.

Çêrokên H. C. Andersen bi kurdî, 13 çêrokên H. C Andersen ji alîyê Halil Mirzan Küçükyıldız ve hatine wergerandin bo kurmancî. Kitêp 84 rupelan pêk tê. Werger bi wergerandina van çêrokan dixwaze H. C. Andersen û hostatîya wî ya çêroknivîsînî bi xwendevanên kurmancî bide nasin.

Ev herdu klitêbên Halil Mirzan Küçükyıldız li ser malpera ***www. kitapyurdu.com*** *ê tên firotin.*

Prof. Dr. Haci Akman li muzexaneya kurdî ya li Norwêcê